

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

# bîrnebûn

Zivistana 2000an

KONYA-ANKARA  
KÜRTLERİ ÜZERİNE

*Wolf Dieter Hütheroth*

GOTINÊN MEZINAN

*Sebiha Özgür*

NÎV RO HEBIS

BO HEMO

*Nuh Ateş*

BİNBOĞALAR'DA  
KÜRT ŞARKILARI-3

*M. Bayrak*

ŞERÊ PISMAMA

*M. Şirin Dağ*

ZIVINGÊ-1

*Musa Anter*

Aksaray Dimilicesi

*Memê Hilkeçikî*



# bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.  
Sé mehan carê derdikeve/Üç ayda bir çıkar

Utgas av Apec-Förlag AB  
Ans. utgivare: Ali Çiftçi

Redaksiyon:

Nuh Ateş, Dr. Mikaili, Muzaffer Özgür,  
Ali Çiftci, Haci Erdogan, Vahit Duran, Bekir  
Dan, Mahmud Duran, Sefoye Asê, M.Bayrak

Adress / Navnişan:  
Box: 3318, SE 163 03 Spånga / Sverige  
Telefon: 0046-(0)8-761 81 18  
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90  
E-Mail: apec@swipnet.se

Navnişana li Almanyayê  
Postfach 900348, 51113 KÖLN / Almanya  
Telefaks: 0049-(0)2203-301630  
E-Mail: bimebun@hotmail.com  
<http://birnebun.subdomain.de>

Bîha/Fiyati:  
Europa: 10 DM Türkiye: 5DM karşılığı TL

Abone ji bo salekê / 1 yıllık:  
İsveç: 280 SEK • Almanya: 40 DM

Türkiye banka hesap numarası:  
F. Yıldız Vakıf Bank Polatlı Şubesi  
Hesap No: 00158001 445398272.

İsveç hesap numarası:  
(Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Almanya hesap numarası: M. Özgür  
Stichwort "Bîrnebûn" Deutsche Bank-Köln  
Konto Nr: 591 2662 BLZ: 370 700 60

Belavkirin / Dağıtım:  
Türkiye

Toplum Kitabevi / Remzi İnanç  
Bayındır sok. 22/1, 0642 Yenişehir / Ankara  
Tel: 0312/434 25 43

Medya Kitapevi / Selahattin Bulut  
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasajı No: 258/6  
Beyoğlu-İstanbul

Gül Kitapevi  
Lise cad. Zafer çarşısı No 23/a / Kırşehir

Holland  
Neçivan Qilori  
Postibus 758  
3000 AT Rotterdam / Nederland  
Tel: 0031-62 60 60 188  
Gironummer: 739 81 58

Danmark:  
Dansk-Kurdiska Kulturhuset  
Nansensgade 32 ST  
TN 1366 Kopenhagen K, Danmark

Çap / Baskı: Apec-Tryck & Förlag AB  
ISSN 1402-7488

Her nivîskar berpîrsiyare nivîsa xwe ye.  
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsen ji  
Bîrnebûnê re têñ, serrast û kurt bike.  
Nivîsen ku ji Bîrnebûnê re têñ, ger çap  
nebin ji li xwedi nayêñ vegerandin.

## Naverok/ İçindekiler



Wêneyê berg: Said Rêzâni

- 3 Ji BÎNEBÛNÊ  
Ali Çiftçi
- 5 NAMEYÊN JI XWENDEVANAN
- 10 FAT QÜLOT  
Berhevkar: Eli Gordoxi
- 13 STRANÊN ALIYÊ ME  
Berhevkar: Osman Alabay (Curuki)
- 14 KONYA-ANKARA KÜRTLERİ ÜZERİNE  
Wor Dîner Hîmmîni
- 19 GOTİNÊN MEZİNAN  
Berhevkar: Şebîlla Özcür
- 21 NÎV RO HEBIS BO HEMO  
Nuh Ateş
- 24 KANLIKİŞLA  
Şükre Gümüş
- 27 HEFT BIRA  
Berhevkar: Mimoşî, İdîan Bayal
- 32 TEKUIFA BÊ FEDI  
Yusuf Yeşilöz
- 35 XEVNA WELATÎ BERÊ  
Dr. H. Mikaili
- 38 ÇIROKA GURÎ  
Cerkezi
- 39 BÎNBOĞALAR'DA KÜRT ŞARKILARI-3  
Hazırlayan: Mîmet Bayrak
- 51 KEÇİKA AXÊ  
Berhevkar: Muzaffer Özçür
- 53 LAWÊ.HESPÊ  
M. Şîrîn Daç
- 57 ŞERÊ PISMAMA  
M. Şîrîn Daç
- 65 ZIVINGE-I  
Musa Anter
- 71 AKSARAY DİMİLİCESİ  
Hazırlayan: Memî Hilkeçî
- 81 SONDA MEZIN Ú NEV NEWROZ  
Mêçovî Darî
- 83 KARACADAĞ  
Feridûn

# Ji Bîrnebûnê

Kovara me bi hejmara 9an kete sedsalake nû, herweha li gor demhijmartina xiristiyanan (Xaçperestan), em ketin çerxeka nû. Li gor teqwîma kurdi jî, ku kurda berê bi piranî li gor wê teqwîmê dem dijmartijن, em ketine sala 2700î.

Di van du mehêن dawî de, meha 12an û meha 1 ê de, sê cejn; cejna xiristiyana, cejna Êzdiyan û cejna Ramazanê û herwiha “mîlenîyûm” jî, hemû li dûhev hatin. Bila cejna we û sedsala we ya nû pîroz be. Bi hêviya ku sedsala pêş me, bo gelê kurd bibe sedsala azadîyê.

Xwendevanên bi rûmet û hêja, sala ku derbas bû bi gelek êş, qatllîam, felaket û bi dek û dolabêن siyasi wek her salêن din, me ew jî li paş xwe hişt. Lê jî bo me kurdan ketina sedsaleke nû pir pirsan derdixe pêş me. Ci ne ew pirsana?

Dema em wek netewe li xwe bindirin, bi hezaran pirs hene. Eger em wan pirsana bi dor rêz bikin, rûpelên kovara me dê têrê nekin, zaten kovara me nikare ji binê vî karî derkeve. Lê, wek însaneki, her kurdek dikare li ser vê bifikire, ka di vê sedsala nû de wek netew; em çava nin? Kêmasiyêن me ci ne? Em bi ci marifetên xwe, derbazî sed-sala nû bûn? Bi hêviya ku li ser van pirsana, di demêن pêş me de însanên ku li ser mesela kurdan pispor in, û bi taybeti jî rewşenbirêن kurda, dê ji bo bersiva van pirsana hinek lêkolinan bikin.

Sala 1999an ji bo insanên li Tîركiyê bi felaketên mezin derbas bû, bi hezaran malbat ji erdhejandinê, bi zar û zêçen xwe ve pêrişan bûn, bi hezaran însan hatin kuştin, kuştin dibêjim; ji ber ku di eynê derecê de erdhêjandin li

welatêن din jî çêbûn, hewqas însan telef nebûn. Çêkirina xanîyan li Tîركiyê bê serûber e. Dewlet li hember wan xanîyana berpisiyar e. Dewletê jî ev berpisiyariya û tedbîren xwe bi cîh neanîne.

Erdhejandin felaketek tabii ye, lê mirov dikare disan jî li hember wê tedbîren xwe bistîne. Lêbelê, li ba kurdan hinek felaket çêdibin, ne tabii ne, lê mixabin heta niha, jê re ti tedbîr nehatîye dîtin. Ez bi xwe, ji gundê Kelhasan im. Kelhasan girêdayî qeza Cihanbeylîyê ye. Di nav gundêن vî aliyê de, însanên ji Kelhasan wek şerker tên naskirin, ji ber ku li gundê me, beri salêن 1970î, ji bo erdê û meselén eşiri, pir lihevxitin û kuştin çêdibûn. Di van sî salêن dawî de, qasî ku ez pê dizanim, tu kuştin li vî gundi çênebibûn. Lê, hezar carî mixabim, pişti sî salî, careka din, xebereke nexwaş!

**Mustafa Karagöz**, 35 salî, ji bo xizmeta gund, barê serokatiya belediyê digrê ser xwe, bi idealeke ku ji gund re hinek xizmetan, bi cesaret bike, wek Serokê Belediyê tê hilbijartin. Pişti şes mehan, dema dest bi projeyên xwe dike, projeyek nayê hesabê cîranckî wî, bi destê cîranî xwe, yê heftê salî, tê kuştin.

Em ji malbata Mustafa Karagöz û ji hemû însanên ji gundê Kelhasan re sebir dixwazin û dibêjin: Serê we sax be. Bi hêviya ku bûyerên wisa li tu dera careke din çênebin.

Kovarek lêkolînî û çandî, ku bi taybeti jî bo kurdêن Anatoliya Navîn derdikeye, divê bi rastî bikaribe bigihê her aliyê Anatoliya Navîn, heta bikaribe li her gundekî, li her malekê belav bibe. Da kû bikaribe irf û edetêن wan deran berhevke û belavke, him jî bikaribe êş û kelema wan bîne zimêن. Mixabin, li ber astengêن sîyasi yêن dewleta Tîركiyê

kovara me li welêt baş belav nabe û diyaloga bi xwendevanên re, wek em hêvî dîkin, nameşe. Li vir ez dixwazim gotinek George Perrot ku di nivîsa xwe ya li ser *Kurdên Haymaneyê* de, ji bo kurdên Anatoliyê gotiye, dûbare bikim:

“ ... *Ev gelê hanê xwedî gelek taybetmendiyên giranbuha ye û gava ku di dawiya dawîn de, ji xewa giran û dirêj rabe, ew belkî yê rojekê ji rojan, ji vê tarîtiyê derkeve û ew ê bandoreke mezin di imparatoriya tîrk de bilize.*”

Bi hêviya ku bi rastî di vê sedsala nû da gelê kurd ji xewa xwe ya dirêj şîyar bibe.

Xwendevanên hêja, di wê hejmarê de cara pêşîye ku nivîsên me yên bi kurdî ji yên bi tîrkî zêdetir in. Helbet ew ji bo me serkeftineke, ku însanên me giraniya zimên dibînin û bi kurdî dînivîsinin.

Di wê hejmarê de dîsa nameyên xwendewanîn li ser weşandina kovarê, li gel pîrozbahî û dilşahiyê xwe, bi dîtinê xwe yên balkêş, va hejmara ji xemilandine. Em bi hêviya ku ev xwendevanên birêz, ne tenê bi naman, divê ji me ra ji folklorâ gel ya ji derûdorê xwe berhevkin û ji me re bişînin.

Birêz Nuh Ateş ji nivîsa Wolf Dieter Hütteroth, besên li ser kurdên Qonya-Ankara'yê ji almanî wergerandîye tîrkî, bi navê; *Konya-Ankara Kürtleri Üzerine* nivîsandiye.

Xwûşka Sebiha Özgür *Gotinêñ Mezinan* yên dorhêla Cihanbeyli'yê berhev kiriye. Em hêvî dîkin, jînêñ ji Anatoliya Navîn dê wek xwûşka Sebiha, çîrok, metelok û stranên folklorik berhevkin û binivîsinin.

Nuh Ateş bi nivîsa xwe ya bi navê *Nîv ro hebis bo Hemo* hekatek ji Qerecedaxê bi devoka gundê xwe bi

zimanek xwaş nivîsiye. Ez bawer dikim hûn ê wê bi kêfxweşî bixwînîn.

Şükru Gülmüş bi serpêhatiyeka xwe ku li gundekî Şereflikoçhisarê bûye, bi navê *Kanlıkuşla* bi tîrkî nivîsandiye. Dîsa mamoste Îrfan Baysal bi devoka gundê Hecîlera, çîroka folklorik a bi navê *Heft Bira* berhev kiriye.

Bi navê *Teklîfa bê fedî* nivîskar Yusuf Yeşilöz, cara pêşî ye ku di kovara me da bi kurdî dînivîsine. Em li vir li ser navê redeksiyonê, ji birêz Yusuf Yeşilöz re, tu bi xêr hatî dibêjen û serkeftina wî dixwazin.

Dr. Mikaflî bi navê *Xevna welati berê kurteçirokek* nivîsandiye. Çîrok, li xerîbiye li ser bîranîna welêt e.

Muzaffer Özgür çîroka bi navê *Keçîka Axê* berhev kiriye û bi devoka gundê xwe nivîsandiye.

Nivîskar û lêkolîner M. Bayrak dîsa bi nivîsa "Binboğalar'da Kürt Şarkıları-3" de stranên gel yên Meraşê bi notan berhev kiriye.

M. Şîrîn Dağ bi navê *Şerê Pismama* bûyerek 1919an bi zimanekî edebî û zelal, li ser reva Fatê û Hesen nivîsiye. Serpêhatiyek balkêş e. Dema meriv vê serpêhatiyê dixwîne, meriv hîn baştır rewşa kurda ya îro fêm dike. Bûyerên wisa li nav hemû eşîrên kurda de bûne. Divê hemû bîn nivîsandin. Her bûyerek bi serê xwe seneryoke filmekî ye. Hûn dê nivîsa birêz M. Şîrîn Dağ bi heyecan bixwînin.

Bi navê *Zivingê* hûn dê bîranînen Musa Anter ji di vê hejmarê da bixwînin.

Bi hêviya ku di sedsala nû de gelê kurd bibe xwadîyê mafê xwe yê çarenûsî, bimînin di xwaşiyê de.

*Ali Gîfçi*

# Nameyên ji xwendevanan/Okuyucu mektupları

## Bîrnebûn'a ulaşmalıyız

Kürtlerin Orta Anadolu'da topluca varlık göstergelerinin tarihi, kesin bilinmemekle birlikte, tahminen 250 yıllık bir geçmişe dayanmaktadır. İlkibuçuk asırhk zaman zarfı içerisinde bölge Kürtlerinin, kendi dillerini bilinçsiz bir şekilde de olsa, Kurdistan'ın bazı yörelerinden (Türkiye'ye sınır olan bölgelerden) daha iyi koruyabildikleri bir gerçektir. 250 yılda korunabilen dilinümüzdeki 50-60 yılda da korunabilmesi, ulusal bilincin gelişmesine rağmen büyük soru işaretleri yaratmaktadır.

Orta Anadolu Kürtleri, dillerini koruyabildikleri dönemlerde, tamamına yakını köylerde yaşamaktaydı. 1970-80'lerden sonra yoğunluk kazanan ekonomik göç (il, ilçe ve özellikle Avrupa'ya), Orta Anadolu Kürtlerinin dili üzerinde büyük tahribatlara yol açmış ve halende açmaktadır. Köylerinden kalkıp başka yerleşim birimlerine göç eden Kürt ailelerinin ezici çoğunuğu, birçok nedenden dolayı çocuklarına Kürtçe yerine Türkçe öğretmektedir. Dolayısıyla genç nüfus arasında, Kürtçe konuşma oranı hızla düşmektedir. Orta Anadolu'daki Kürt köylerinin geneli, göçe ve ona bağlı olarak asimilasyona yenik bir durumdayken, Tavşançalı, Yeniceoba ve benzeri büyük beldelerdeki ekonomik gelişme Kürtçenin korunabilmesinin lehinedir. Köylerdeki trend gibi bazı

büyük beldelerde (Gölyazı) de göç devam ettiği takdirde, büyük beldelerinde dil yönünden köylerin durumuna düşmesi kaçınılmazdır.

Önümüzdeki yıllarda kürtçeyi asimilasyondan kurtarmak, bu bölgenin duyarlı insanlarına düşmektedir. Bu anlamda, bölge halkın duyarlı insanların, fikir ve öneri geliştirip birnebûn'a iletmeleri, bu can alıcı sorun nedeniyle güçlü bir işbirliğine gitmeleri halinde sorunun çözümü için bir başlangıç yaratılacaktır.

## E. Yıldırım

## Sevgili Bîrnebûn çalışanları

Bir yakınınım evinde derginin 5. Sayısını görünce önce çok şaşırdım. Fakat, kısa sürede şaşkınlığımı üzerinden attım ve mutlu oldum. Orta Anadolu Kürtleri adına böyle zengin içerikli ve kaliteli bir dergi yılların özlemiydi. Sizleri kucaklıyorum.

Bu işte bana düşen görev derginin dağıtımını, tanıtımını ve satışı yapmak olacak diye düşünüyorum. Dergiye abone olduk ve elimize tüm sayılar ulaştı. Evinizi 3 ayda bir birnebûn ısıtacak. Saygılarımla.

## DK - Kemal Çihanbeyli'li

## **Değerli Bîrnebûn çalışanları,**

Ben Konya Kürtlerinden olup, şu anda İsveç'te Karolinska Enstitüsün'de doktoramı yapmaktayım. Öncelikle hepинize böyle bir yayını düşündüğünüz için yüreğinize sağlık diyorum.

Yaptığımız çalışmanın tarihin tozlu raflarında çürümemeyip, onun altın sayfalarına, altın harflerle yazılacagından emin olabilirsiniz. Buradan okuyucularımıza bu derginin yaşamasının sadece okumakla olmayıp, üretkenlikleri çapınca ellerinde bulunan, dergide yayınlanabilecek her türlü materyali (şîir, masal, öykü, fıkra, derleme ve tabiki kendi yazdıklar v.s.) sizlere ulaştırmاسının tarihi bir görev olduğuna inanıyorum. Çünkü tarihe ancak yazarak ve üreterek not düşebiliriz, dolayısıyla herkesten ricam, içinde bulunduğu ortamı, zamanı, çağı, sürekli okuyup, kaleminizle yazıp, yüreğimizle severek, gelecek nesillerimize aktaralım. Bunun için herkesi sevmeye, düşünmeye ve yazmaya davet ediyorum. Unutmayalım, ki biz kendi tarihimizi kendimiz yazamasak, efendiler kendilerine göre yazacaklardır. Gelecek güzel günler adına *hezar silav li we...*

*Hayrettin Güven*  
guven@cbt.ki.se

**Slaw Hev**

**alno !**

İlk önce Kurt halkın yeni yılını geçte olsa en içten dileklerimle kutluyorum. Dilerim ki 2000 yılı tarihimize bize güzellikleri getiren yılların başlangıcı olur. Fakat untumayalım ki

güzellikleri bizler mücadele içinde yer alıkça daha kolay elde edeceğiz. Şahsen, bazı boşluklar hissediyorum, Kurt halkın aydın bir kesime ihtiyacı var, bunuda biz Kurt gençliği, üzerinde yoğunlaşmalıyız, yoğunlaşmalıyız ki aydın, bilinçli, geleceğe daha emin adımlar atalım. Kurdistan halkın yıldarca çektiği acılara birsekilde kendimizi özgürleştirerek, güzelleştirerek, son verebiliriz. Biz gençlere çok iş düşüğünü unutmayalım. Bu konuda her Kurt geneide üzerine düşen görevi, büyük bir ustalıkla başarácaktır. Bundan da eminim. Fakat beni kaygılandıran bir konu var, ki oda Avrupa'da yaşayan Kurt gençliğinin hızlı bir şekilde batlaşması ve kendince özgür olduğuna inanması, beni gerçekten de kaygılandırıyor.

Özgürlük nedir arkadaşlar? Özgürlük insanların kendisini sorgulamasıdır, kendi muhakemesini yapandır, kendi özgür iradesine dayanarak kendi kararlarını alan insandır. Onurlu bir şekilde halkın sorunlarına eğilen insan özgür insandır. İşte batlaşmayı özgürlük sanan genç kesim beni kaygılandırıyor. Aynı zamanda da düşündürüyor... İşte bizim bir boşlumuz. Yeterince bilinçlenmemiştir. Yeterince bilinclendirecek insamız yok. Ben Kurt halkın bu konuya eğilemsini istiyorum. Halkımıza eğitimim ne kadar önemli olduğunu anlatmanın ve bunu her birey için bir zorunluluk olduğunu göstermemiz gerek.

Devrimci sevgi ve saygımla.

*Helen Gorki*  
gorki@hotmail.com

# Kelhasan da bir ölüm dıramı


Bîrnebûn Dergisine!

Değerli okuyucular, ben hayatmda ilk kez bir dergiye, hemde bir Kürt dergisine yazı yazıyorum. Bu bana heyecan ve cesaret veriyor. Çünkü; Kürtler tarihlerini hep sözlü olarak korumaya çalışmışlar, onun içinde Kürtlerde yazı dili fazla gelişmemiştir. Ben acı bir olayı yazacağım için de, çok üzgünüm.

Olay, benim edindiğim izlenimlere göre şöyle başlıyor: 1999 Nisan yerel seçimlerinde, Konya'nın Cihanbeyli ilçesine bağlı Kelhasan kasabasına, 1964 doğumlu **Mustafa Karagöz** seçiliyor. Seçimden hemen sonra çalışmalarına başlıyor.

Çalışmaları arasında; bir pazar yeri projesi ve pazar yeri için su çekme planları da var. Belediye planlarını uygulamaya başladığında, daha önce köyün su ihtiyacını karşılayan, ama yeterli olmadığı için, kullanımını bundan yıllar önce iptal edilmiş. Mustafa Secilmiş'in tarlasındaki su, tekrar gündeme gelir. Sorunda, bundan sonra başlıyor. Tarla sahibi, suyu vermemekte direnir. Belediye başkanıda sorunu çözmek için adli makamlara başvurur. Tarla sahibi, Mustafa Secilmiş'de bu durumu mahkemeye veriyor.

Adli makamların vereceği kararı beklemeden 19/10/1999, salı sabahı, saat 9<sup>00</sup> dolaylarında kasabanın ortasında Mustafa Secilmiş, başkan Mustafa



Mustafa Karagöz, 1964-1999

Karagöz'e yaklaşır, selam verip, *ne olacak bu durum*, diyor. O da *zaten biz mahkemeye vermişsiz*, der demez, *öyle mi* diyor ve daha önce hazırladığı silahla, Başkanı 8-10 yerinden vuruyor. Başkan Cihanbeyli Devlet Hastanesine götürürken, Turanlar köyünün yakınında vefat ediyor.

Ben burada başta yakınları olmak üzere, tüm Kelhasan Kasabası halkına baş sağlığı ve sabır diliyorum.

Böyle olayların dunyanın hiç bir yerinde olmaması dileğiyle.

11.01.2000

Mevlüt Ekici

Rheinfelden-İsviçre

## Teşekkürler

Öncelikle böyle bir dedrginin oluşu, hatta bu derginin internette sayfası olması, bir İç Anadolu Kürtü olarak çok sevindirdi. Derginizi bir kaç sayı hariç, hep takip ediyorum. Derginin hem tarihsel öğretisi hem yanında, kültür, dil ve edebi metinleri de içermesi dergiye daha bir güzellik katıyor. İç Adadolu Kürtleri, örneğin ben Bala Kürtlerindenim, ama nereden geldiğimiz çelişkiliydi, bu her halde İç Anadolu geneli için geçerliydi. *Bîrnebûn* sayesinde kendi geliş ve göç öykümüzü öğrenmiş oldum. Yalnız sizden ricam, ben Ankara da ikamet ediyorum. *Bîrnebûn*'un diğer sayılarını nasıl bulabilirim?

Eğer şiir veya hikaye-fıkra gibi, düz yazı türlerini derginizde yayinallyabiliyorsanz, bir şeyler yazıp gönderebilirim.

Çalışmalarınızda başarılar.

*Li xwe rînd bînerin!*

*Nihat Yılmaz / Ankara*

## Selam dostlar

Orta Anadolu Kürtlerin sesi selam  
Büyüyecek gelişecek senin sesin  
Duyulacak senin sesin  
Bakma öyle konuşmadığımıza  
Bakma öyle sesiz kaldığımıza  
Yanlıyorsunuz  
Ses geliyor  
Doğu çocuk  
Her ne kadar ülkesinden  
kopuk  
Gözümüz aydın  
*Bîrnebûn*  
doğdu ...

*Devrim*

## Silafêñ germ li we hevalêñ delal!

Ez ji we ra hemza xwe tiji gul dikim  
û ji we hemûyan re dişeynim. Ez bi  
rûpela we serbilind û gelek dilxwêş  
dibim. Ez nuha dikarim bibêjim; ez  
kurdê Qonyê me. Ez bi we hêdî serbilind  
im û dibêjim ba hêdî kurdên Anatolya  
navîn rabin ser linga û bibêjin em kurd  
in û kultura me, zimanê me dîroka me  
û welatê me heye. Ez ji we tişteki pîr  
mezin dixwazim; karê xwe dewam kin  
hetanî em azad dibin. We ra şîva pîr pîr  
silaf dikim û dibêjim serkeftin ji we ra û  
ji gelê me ra!

*Ji we ra oxir biy.*

*Nihat Yılmaz*

## Xebatkarêñ hêja yên Bîrnebûnê!

Hejmara heystan ya Bîrnebûnê ku we  
şandibû navnişana min, gêhişt destê  
min. Ji ber vê bihîstyariyê we bi dil û  
can spasiya we dikim.

Bî gel vê narneyê şîira xwe ya bi navê  
“Dûr i” dişinim. Hêvidar im, ku hûnê pê  
kefxwêş bin û vê şîrê pelên Bîrnebûnê  
de biweşinin. Ku hûn bixwazin, ez dikarim  
şîrîn xwe yên din jî bişinim.

Bî hêviya serkeftinê we yên nû,  
rêz û silavêñ xwe pêşkeş dikim.  
Bîmînin di xweşiyê de.

*Muhammet Gözütok*  
Özel Tıp Kapalı Cezaevi  
Ermenek/KARAMAN

# DÛR Î

*Şevêñ pêxwas destê min diqerisînin nikarim mistdim  
birîna stêrkên qaşegirti  
hilma te ya kevnare  
li rûyê min i şikestî dixe  
digizgizim  
lê, tu dûr i*

*li peristgeheke xopan a Zerdeş  
li te gerîyam  
agirê lerzok û zirav a findekî bûyî  
di şermezariya demê de xive disewitandi  
bi bêhêvî*

*jî dûr ve  
qijîna bajârên ducan dihat  
li gûndê kavilkiri  
mitribê diranzer  
beroşen mis ên malan pîle dikirin  
bi hêviya vegera gundiyan koçberkiri*

*dûr i  
lê, dûrbûneke nebikîlometreyî  
jî rîya ku kalêñ min bi heşturan ve hatibûn  
bi tremblekî vegerîyam  
mîna ku cixere bikişinim  
bi her nefesekî  
jî nifşekê derbas dibûm  
li şuna kelekan  
pirêñ mezin hebûn li ser çeman*

*dûr i  
lê, ne nepen i  
jî baçermokan ditîrsî  
dizanî, bê dawî ne  
lê, disa jî stêrkan dihêjmêri  
jî azadiyê hez dikî  
rondik li te nayê  
lê, pê tîna dijberên aşen bê dişkînî.*

*Muhammet Gözütok*

# FAT QÛLOTÊ

Nota: Rojan Şîyar

Berhevkar: Eli Gordoxî

Herêm: Anatolîya Navîn (Kulu-Cîhanbeyli)

Wê klamê 2-3 (şikle) versîyonê xwe henê.

Hewîr mayê lê  
Di teştêda lê  
Bûkê mayê lê lê  
Paş perdê da lê lê  
Zawa mayê lê  
Di xewnêda lê  
Hespî mayê lê lê  
Di terlêda lê lê

Hîlbad hîlba lê  
Fat Qûlotê lê  
Çima tu natî kurbî kurbî  
Bi eynatê lê lê  
Çima tu natî lê lê lê  
Bi eynatê lê lê  
Malê hana lê

Malê menê lê  
Ji wana hûwa lê lê  
Mal tûnene lê lê  
Ma kes xwe ser kesî ra nepesinê lê  
Ji Fatom bittir lê  
Rind tinene lê lê

Hîlbad hîlba lê  
Fat Qûlotê lê  
Çima natî lê lê  
Bi eynatê lê lê  
Baran barî lê  
Li, herde ket lê  
Sevda me ho lê lê  
Bi dûne ket lê  
Eşqa me oy lê lê


DAVUL



ZURNA



BAGLAMA



Bi dûne ket lê  
Wextak Fatika min  
Heynan birin lê  
Silê Çutkî lê lê  
Bi çolê ket lê

Hilbad tuwe lê  
Fat Qûlotê lê lê  
Çima natî lê lê lê  
Bi eynatê lê lê

# KULU İLÇESİNE İSTİTASTİKLERLE BİR BAKIŞ

## 1997 GENEL NÜFUS TESPİTİ SONUÇLARI

İLİ: KONYA İLÇESİ: KULU

### İDARI BİRİMLER

### NÜFUS SAYISI

	1990	1997
KULU İLÇESİ(TOPLAM)	58.712	56.706
ŞEHİR MERKEZİ	17.425	19.509
ACIKUYU	980	641
AĞILBAŞI	374	291
ALTİLAR	988	941
ARŞINCI	385	332
BEŞKARDEŞ	1.679	1.213
BOĞAZÖREN	244	147
BOZAN	1.185	806
BURUNAÇIL	403	266
CANIMANA	1.082	1.355
CELEP (B)	2.087	2.626
ÇÖPLER	438	303
DİPDEDE	604	863
DOĞUTEPE	272	167
FEVZİYE	240	131
GÖKLER	95	46
GÜZELYAYLA	264	203
HİSAR	272	168
KARACADAĞ (B)	2.611	2.888
KARACADERE	508	498
KIRKUYU	414	211
KIRKPınar (B)	1.747	2.131
KOZANLI (B)	4.344	5.416
KÖMİŞİNİ	1.502	919
KÖŞKER	150	127
SARIYAYLA	285	234
SEYİTAHMETLİ	59	22
SOĞUKKUYU	217	191
ŞEREFLİ	471	324
TAVLİÖREN	342	264
TAVŞANÇALı (B)	5.848	5.592
TUZYAKA (B)	1.997	2.139
YARAŞLI	2.006	1.110
YAZIÇAYIR	1.079	1.064
YEŞİLYURT	1.018	867
ZİNCİRLİKUYU (B)	3.099	2.702

\*Edinilen bilgilere göre sayımları bazı köylerde sayımları tamamlamamışlardır.

Yukarıdaki bilgilerden de anlaşılacığı gibi köylerde nüfus azalmaktadır. Bunun temel nedeni göçtür. Avrupa'nın değişik ülkelerinin yanı sıra, Ankara ve Konya illeri ile Kulu ilçe merkezi göçün yapıldığı yerlerdir. Kulu ilçe merkezi nüfusunun % 15-20 Kürtler oluşturmaktadır. Buna göre ilçe merkezindeki Kürt nüfusu yaklaşık (net bir sayılmak bilinen nedenlerle olanaklı değildir!) olarak 3.500 ile 4.000 arasındadır.

Kürt köyleri toplam nüfusu: 28.231, Toplam Kürt Nüfusu ise: 32.000'dir.

# Stranê alîyê me

Berhevkar

*Osman Alabay*

## Şivano

Serî min diêşe nizam janê  
Dili min diêşe nizam ta nê  
Bijeşk doktor nafileye  
Destî şivanî, xelkê bû dermanê  
Serî dişom bi ave gille  
Gul berdane dorê milê

Şivanîye meke tu ye ker be  
Heştiran mekşîne tu ye şevder be  
Ser dili minda hespê kî xwe bikire  
Kumandanê serleşker be

*jî gundê Xelikan*

## Nabim

Ez bûm berfa serî çiya  
Ro bilind bû gîş helîya  
Rindê destî min bigirê  
Bendö dile min qetîya

Çiyayên bilind bê dar nabin  
Nawalên kûr, bê av nabin  
Keçê destî min bigire  
Tu dizane, bê te nabim

Ez derketim serî gira  
Min bang dikir bav û bira  
Rindê çavê te newînîn  
Pişa min xistin, bi kevira

## Gundê me

Gundê me devî newalê  
Ez derketim hêşıya malê  
Herki çavî min li bejnê te ket  
Min zor dayî ser eixalê

Rêye Polatiê, rêke duz e  
Lê dibare berf û buz e  
Ekî yarê xwe jî qîz e  
Heta sibê pê dilize

Erê bavo erê bavo  
Qelingê min li te xwîn û avo  
Te ez nedam xortî bejn ziravo  
Te ez dayim kalî qumqumî dev kulava

Erê dayîk, te yê nezanê  
Tû kor bibe her du çavanê  
Tu kût bibê du junîyanê  
Te ez nedam xortî bejn ziravo  
Te ez dayim kerî bêr malenê.

*Remziye Eti Kino*

Xaniye bavê te korlax in kêç ketinê  
Memikê te bûne şemşemokê sîna,  
bihn ketinê  
Hatîn sükê firotine, ez kiriqanê hilgirtinê  
Aman Satê aman Satê  
Te ez helandim qat bi qatê  
Gundê Xofê bû Hûkumatê

*Klama Huseyîn*  
Tür/Sîna Şuşê-Yunak

*Remziye Eti Kino*

Çavê belek dikîn henga  
Xwe heqandî tima şengê  
Piyê qulot, bazin tengê  
Lêv helisê, xwaş e dengê

Keçik delal xastî çewî  
Ser kaniye bêxut payî  
Kulîlkê sor jiyan dayî  
Çavê xestek li du mayî

Çav dikenin dilî zîz e  
Ser govendê xwaş dilize  
Baran barî çilk erdê ket  
Dengê defê bi ser gund ket

### Sîna Şûse

### Li ser Kamîl\*

Ziya Ziya Kamîl Ziya  
Diya te nemir ne pêqîya  
Bûm dêlgura serî çîya  
Dahişt kerîye Çimenliya

Hespî Kamîlî min rewan e  
Tel û bûjî girêdane  
Mal şewityê carê derê  
Hespî wa ye, ka Xûdanê

Li Haymanê Canimanê  
Keçik revand Kurdistanê  
Dili êvîn hîro şabû  
Rikê neçê orte rabû

Gupê xwe sor, çavê xwaş kil  
Bijang bûn tîr, avet ser dil  
Porî zêrî, sipîye can  
Hevalê wenbihûstê man

Bejnê dirêj, xotê fere  
Can kalûgevr, bîn biharê  
Rindê delal, tim êvîn xast  
Tilîye zirav bedewîm dest

Pirtûk xwand, pelik vekir  
Porî zêrî, tilya şehkir  
Pirê cindî şox û şengê  
Klam gotî xwes e dengê

Bejnê çeleng pirr olfazê  
Pil vemaşin doşî pezê...

### Cûruktî

\*Li gundê Çîman ê hatî gotin

# KONYA-ANKARA KÜRTLƏRİ ÜZERİNÉ

*Wolf Dieter Hütteroth*

Almanca'dan çeviren: **Nuh Ates**

Alman Wolf Dieter Hütteroth mesleği itibarıyla Coğrafya bilimcisidir. O, 1960–61 ve 1962/63 yıllarında İç Anadolu'ya alan araştırmاسında bulunmak üzere gitmiş.


Hütteroth, ‘*Landliche Siedlungen im Südlichen Inneranatolien in den letzten vierhundert Jahren*’ adlı araştırmاسında Konya-Ankara arası bölge Kürtlərindən de bahsediyor. Göçebe Kürt aşiretlerinin yanısıra Türkmen aşiretlerinin ve muhacirlerin (Çerkez, Tatar) bu bölgeye gelişи, yaşam biçimini ve yerleşimi hakkında etrafı bilgiler içeriyor Hütteroth'un araştırmاسı.

Bu araştırmada, Konya-Ankara Kürtləri Konusuna değinilen bazı bölümleri, Türkçe'ye çevirerek yayınlıyoruz.

19. yüzyılın kısmen belirlenebilen son çeyreğinde, İç Anadolu'nun büyük bir bölümündə, halkın çoğunluğu yerleşim yerlerini yılda en az iki kere değiştirmekteydi. Değişik çadır türleri yazılık yerleşim alanlarında yaygın bir biçimde görülmüyordu. Ancak halkın mobilitesi oldukça belli köy ve aşiret sınırları içindeki alanlarla sınırlanmış ve daraltılmış bir vaziyetteydi. Sadece Toroslarda, kışıkları Akdeniz kıyılarının düzliklerinde bulunan ve tümdeñ göçebe olan

aşiretlere rastlanmaktadır. İç Anadolu'da 19. Yüzyılın başlarında, tüm aşiretin yeni mera ve yerleşim yeri arama, tahsildarlardan kaçma veya iç çatışmalar nedeniyle sıkça uzak yörelere yapılan ve peryodik olmayan göçlerine rastlanıyordu<sup>(1)</sup>.

Ancak bu gösterler 19. Yüzyılın son çeyreğinde son buldu. Yöresel etnik yapılanma, günümüze dek süren şekliyle kendini korudu (Bkz. Harita).



1870'de etnik aşiret yapılanması (Yazarın kendi tespitlerine göre)

#### *Harita içi Notlar:*


Harita'da 1870'de var olan tüm yerleşim birimleri belirtilmiştir. Araştırma bölgesinin Kuzeyindeki mevcut yerleşim birimleri 1890'daki duruma ve daha sonraki kaynaklara (Ankara Salnamesi) göre belirlenmiştir.

- Yerli Türk köyleri (aşiret yapısı bilinmeyen)
- Kişi köyleri ve Küçük Türkmen köyleri
- Yaklaşık olarak Türkmen aşiret bölgesi, Türkmen aşiret adları ve bazı alt aşiretler
- Aşiret örgütlenmesine muhtemelen sahip bulunan ve günümüzde yerleşik Türklerin kişi köyleri
- Kurtçe konuşan halkın köyleri
- Yaklaşık olarak Kürt aşiret bölgeleri ve tespit edebildiği kadariyla alt aşiret adları.

Bozkır bölgesinin Haymana'ya doğru uzanan Kuzey kesiminde bulunan kışla köyleri, 1870'lerde bir yandan büyük yerleşim birimi diğer yandan adları bilinen aşiretlerin merkezleri konumunda bulunuyordu. Yeniceoba, Bulduk, Kozan, Celep, Kürdoğlu, Dondurma (Halikanlı), Yapalı ve Taşpinar'da aşiret ve kısmen alt aşiret adları halen bugünde biliniyor. Ve yöreye yerleşimin ne zaman gerçekleştiği bazen yılına varınca yaya kadar kesin biçimde belirtiliyor. Buraya yerleşim geleneği kesinlikle 200 yıl geçmiyor.

Dondurma'da bana, buraya 1858'de yerleşiklerini söylediler. Reşvan Kürt aşireetine mensup köylere, örneğin Karagedik'e 1846/47, Burunsuz-Serefli'ye 1844, Bulduk'a 1853/55'de yerlesildiği anlatıldı. Osman Paşa adında biri onları Doğu Anadolu'dan Haymana'nın güneyine sürüp yerleştirmiş. Şeyhbızın Kürtləri ise yerleşim tarihlerini 1800 ile 1810 olarak belirttiler. Benim bildiğim en eski belge, Ahmet Refik'in yayınladığı 244 nolu olup, 1776'dan kalmadır. Bu belgede, Karaman eyaletinin soyguncu aşiretleri arasında "Karaca Kürt" adı geçmektedir. Ancak bununla, Konya vilayetinin kuzeyinde bulunan Karacadağ yöresindeki Kürtlərin kastedilmiş olup olmadığı kesin bilinmiyor. Resmi belgenin tarihi ile Şeyhbızın aşireti'nin yerleşim tarihi arasında 30 yıllık bir süre farkı bulunuyor.

19. yüzyılın ikinci yarısında, İç Anadolu'nun bozkır bölgesinin kuzeyinde yer alan bu kışla köylerinde de, yerleşim yerini değiştirme sistemi, bugün tespit edilebileceği gibi, aynı biçimde ve uzun süreden beri olmasada, Tuz gölünün



güneyindeki gibiydi. Kuzeydeki bu kışla köylerindeki çoğu Kürt aşiretleri 19. Yüzyılın ortalarına kadar daha çok göçeve olarak yaşıyordu. Örneğin; Dondurma'lilar 1860'larda her yıl güneşe doğru, peryodik olmasada, sıkça kışın Akdeniz'e kadar, Adana çevresine kadar uzanan göçlere çıktıığını hatırlıyor. Reşvan aşireetine mensup kuzeydeki kışla köylerinde, özellikle Bulduk'lu ve Yeniceobahlar 19. Yüzyılın ortalarına kadar aşiret federasyonunun bir bütün olarak Ankara'nın ve Çubuk'un kuzeyindeki dağlık yörenelere yapılan göçleri hatırlamaktalar.

Yazlık amaçlı yaylaya göçlerin kışlak köylerin çevresiyle sınırlandırılmış olması bu bölgede yeni bir oluşum. Bunu, bölgenin kuzeyindeki kışla köylerinde, 19. Yüzyılın ikinci yarısından önceye has olan bir durum olarak sayamayız...

19. Yüzyılın ikinci yarısında, Haymana'nın dağlık kesiminde yaylalık konusunda, ancak kit bilgilerden ötürü, sınırlı

belirlemeler yapmak mümkün. Öncelikle, Perrot<sup>(2)</sup>, Ainsworth<sup>(3)</sup> ve Tschihatscheff<sup>(4)</sup> tan kalma raporların iki önemli konuda çakıştığını belirtmek gerekiyor. Birincisi, hazır düzenli köylerin var olduğu gerçeğidir. Seyahat güzergahları üzerinde bulunan bugünkü yerleşim yerlerinin hepsi belirtilmiş. R. Kiepert'in güney Haymana dağlık kesimine ilişkin belirlemelerini ağırlıklı olarak bu yazarlara dayandırıldığı için<sup>(5)</sup>, 1906 tarihli haritası 1870'den önce, topografik konumlanışı yanlış yada belirsiz kalsa da, var olan yerleşim yoğunluğunu içeriyor ve güzergahlardan uzak bulunan yerleri ihtiva etmiyor.

İkincisi, Haymana'nın Kürt yerlileri öncelikli olarak hayvancılıkla uğraştığı ve kısmen uzak yörelere göçe çıktıığı belirtiliyor. Haymana'nın güneyindeki aşiretlerin, özellikle Cihanbeyli ve Reşvan aşiretlerinin İlkbaharda halen,

halk arasında hatırladığı gibi, Kuzeye doğru, Ankara'nın ve Çubuk'un kuzeynindeki dağlık kesimlere, Kızılcahamama dek uzanan göçleri belirtiliyor<sup>(6)</sup>.

Aynı aşirete mensup, mevcut köylerden kopmadan uzak yörelere yapılan göçler, Kurtlerin gelmiş olduğu doğu Toros'lardaki durumla ilişki benzerliğini akla getiriyor. Orada da, aşiretin tümü göcebe olarak yaşamıyor, bir bölümü daha çokta aşiret alt birimlerinden oluşan sürü sahipleri ve aileleri bu tür göçlere çıktııordu<sup>(7)</sup>. Nüfusun geri kalan büyük bölümü köylerde yada yerleşim yerine yakın olarak kurulan çadırlarda kahiyordu. Her iki kesim arasında çok yönlü ilişkiler korunuyor, aynı aşirete mensup olunması halinde bu, mülkiyet ilişkilerine göre değişen tesadüfü bir çeşit iş bölümünü andırıyor...

<sup>(1)</sup>- Bkz. De Planhol, 1959, s. 527

<sup>(2)</sup>- G. Perrot, les Kurdes de l'Haimaneh, Rev. Des Denks Mordes XXV, 2, Paris 1865

<sup>(3)</sup>- W.F. Ainsworth, Travels and Researches in Asia Minor, London 1842, Bd.I, s.136-155

<sup>(4)</sup>- P. De Tschihatscheff, 1867

<sup>(5)</sup>- R. Kiepert, Karte von Kleinasiien 1:400 000, Bl. B III, Angora

<sup>(6)</sup>- Ainsworth 1842, Bd.I, s.146

<sup>(7)</sup>- W. Hüteroth, Beobachtungen zur Sozialstruktur Kurdischer Stämme im Östlichen

Taurus, z.f. Etnologie 86, 1, 1961, s.32

# GOTİNÊN MEZİNAN

Berhevkar: *Sebiha Özgür*

- Akil pirr sermîyan e, ne karê her merîya ne.
- Berî xwangê berve bira, berî birê berve kevira.
- Bi vestîyayî kir, bi vesîyayî xar.
- Bikê bi kîzê, li ber cennetê bilîzê.
- Bu xerman e, ne bu derman e.
- Buka paş perdê, kes nizane nasîbê kê.
- Bukê li ser hespê kes nizanê nasîbê kê.
- Büye marê nîv kuştî.
- Çavêن li deriya, xulî bi seriya.
- Çî neçê para keçê.
- Cumê xeyî cuyê li henîya xwe xistiyê.
- Demika gûla, yeka sosina.
- Destê destâ bişon, destê çexbin rûya bişon.
- Dev tuneyî
- Di gunda de mer neman, ji dîkara dibên Abdurahman.
- Dilî xwangê bi xwangê bişewtiya çelkê sê(sav) ne davite ber.
- Diza ji diza dizî, erd ezman lêrizî.
- Dizi biharê peyîzî li xenê.
- Ecer hatin, kevin xelat in.
- Erev bi erez ra gotiye magî qûn reşo.
- Gewenda têr xwar, yê li dolê xin.
- Heştira le pê girêde.
- Heyî yî kani ye, tûne yî genî ye.
- Ji qara kete bin bara.
- Ji şorê nabêre rev gerek.
- Kerê şiv li gu.
- Kes ji arê xwaş narive.
- Kês nasibî kesî naxe.
- Kevir li sêr kevir name.
- Kevirî xwê yî giran e.
- Kutte bi ta ketiye.

- Malî dine li dine bime.
- Mar ji punge heznakê, punga li ber poz birûzê.
- Memir e memir e hefa tê, mirî şunda kêfa tê.
- Mî bi nigen xwe, bizin bi nigen xwe.
- Milê gu dixwe terawîya nake.
- Mîna marî di tur da ye.
- Mîna maye(hevîrtîrş) mirdesî.
- Mirîşkê hek kiriye, qûna dîk dişê.
- Miriyê pir şuştî yê tira bikin.
- Mîya çê li mexel ê.
- Navî bajarî dur, xweş e.
- Ne bi malî pir ne bi gerdanî sor.
- Nifirê hêrin êzmana, şiva verin xudana.
- Palî yê çê berdane cê.
- Paşîye şewereşê tim hîverunê.
- Pê baranê ga cil dikê.
- Quzî avê li rîya avê bişke.
- Ro terin, qêda-bela narin.
- Sal car nabin yek.
- Sere xwe wekê li bextê xwe mêtke.
- Serê xweyî şuştîye henayî xwe helmaştîye.
- Serra xirxalo bin ra korpolo.
- Sevîya rokê xerdiye, 7 cara mal barkiriye.
- Teka çalê, rizkî salê.
- Şil kir zîya bike.
- Şîri da bigrê hetta pîri.
- Şorê xeraw ya xudiya ye.
- Tu devî ma bûkêy, ez jî yî malê exê.
- Vestîya kir, vesîya xar.
- Virin, li mala ma jî pir in.
- Xalan xelk in apan milk in.
- Xelk çû raketine Mest(Mistefa) hatê runiştinê
- Xêlk nenika meriya ye.
- Xizana halî xwe bizaniya riza bixarina.
- Xudanê sebrê bîye mîrê misirê.

## NÎV RO HEBIS BO HEMO

*Nuh Ates*

Zivistanekê li gundê Germîyan, heyamî sar, wekî zuqim bû. Ji serma, dev û rûyên meriya diqerisîn. Mina ku goti, te tuk kira, tukê te ya li hewa bicemdiya. Berf û dupiyê li ber hev didan.

Gundiya digotin, dupiya Hesenê Mamê ye. Hesenê Mamê şivanê axlera wûye. Ew li çolê, li hewşo bi keriye pez va, vi ber dupiyê ketiye; di bin berfê da maye û miriye. Keriye pêz ji telef bûyê.

Kesi nedizanî, ku va afeta kîngê bûye, belki pênce, belki jî sedsalî berê. Her ku zivistanê, di eynê wextê da, dupi dibû, digotin, va dupiya Hesenê Mamê ye.

Zivistanê van deran, ên deşta Anatoliyê û li derdorêñ gola xwê, carina mîna yê sibiryê ne. Li derva, bayê borêz vîzeviz bû, mîna ku li viriskiye ke bitirs dixist. Wî berfa teze û kewke dida ber xwe, berba dikir, pê dilist û di bir li kendal, li kîrt û kortan cidihîst.

Wê şevê qe xew neketibû çavê Adulê. Mîrê wê, mîna Hesenê Mamê, li hewşo, li ber pezê axlera bû. Devdeve siwê, êdin ba ketibû û tina sermê şikeştibû.

– Hemo rawe, wexta mektewê hat... Rawe lawikê min, here mektewê, bixwîne û bi merikî çê we, Adulê digot.

Her siwê, wexta ku wê Hem ji xewê radikir, va şora digot.

– Hemê qe dil tunebû, ku ji xewa siwê û ji nav nivînê germ rawe. Wî yekcara xwe li nexwaşî dina ya jî li mane û muna digerîya ku nehîre mektewê.

Lê Adulê, ji ya xwe nedîma, nig dida ser. Hemo neçar dima radiwû.

Sowê gimegim wû, vê diqet. Tîna arê kerma, kix û kêsê li odê zu belav dibû.

Hemo rawû, dest û serçavêñ xwe şuştin, kincê xwe li xwe kirin, paşê li kîleka sowê runişt, xurînî xwar. Pêy xurîniyê, turikê xwe yê kitawa heyna û kermek jî da bin çêng, ji mal derket û da riya mektewê.

Arduyê mektewê li ser malan wû. Her teleweki ji dehpanzdeh rojan carekê kermek yan jî tepikek dibire mektewê.

Bi rê da, Hemo raste gelho hat. Gelho û Hemo him cîran him jî hevalê hev bûn. Wana ji hev pir hezdikirin.

Li nîvê rê, wana bîstkê mektewşarı û serma ji bîrkirin. Ge, bi topê berfê tê zîlikên cemêdê, yêñ ku bi çurikên xanîya da dêwistibûn, kewdikirin. Ge, xwe ji neqewen piçûk da xûşdikirin.

Dengê zîlê mektewê listika wan birri. Ew bi lez berwe mektewe meşîyan.

Mektewa gund ecer bû. Ew bi bilîndiya xwe di ser xanîyê gund gîştan

ra bû. Ser xanîyê gund bi xwêliyê nixmandibû, lê ser mektewê bi texte û kiremît bû.

Mexlîm yekî tenê bû. Li gund, mîrê vê simêl û bi qirewet tenê ev bû. Mexlim û mektew ji gundiyan va weng xay dikirin, ku tê bigota qey ew ji dunêke din hatine.

Pênc sinif giştik di dersxanekê da, li ba hev bûn. Li diwarê dersxanê yê pêşî textê reş li dar xistibû. Li jor têxte, bi herfîn gir û bi tirkî nivisek wegna hewû:

– „Di jiyanê da rêberê ên rind îlm e“.

Di ser vê nivisarê ra, resmî Ataturk li dîwîr xistibû. Hemo li ber textê reş, beri berive sinifê, bi pê dawesibû. Wî seri kiribû ber xwe û guçikên ceketê xwe nure serhev dikir. Mêxlîm navê wi xwendibû, ew rakiribû têxte.

Mexlîm yekî dest bi ço bû. Ew di dersxanê da vê ço nedibû.

Ew tenekî nêzke Hemê bû, bi hêrs û bi tirkî bang kir, got:

– Tu nizanî ku li mektewê û li mal bi kurmanci dengkirin yasax e?! Dizanî dizanî, tu ci heywanî! De, destê xwe dirêjke!

Bi vê gotinê va, wî ji vêzka da ço berjor heyna û go zing li destê Hemê xist. Wêrinî vi Hemê ket. Hêstirk ji çavên wî firiyan. Sîziya dêst, mina axuya mara, li nav canê wî belav bû. Destê wî yê rastê mîna ku puç bûbû. Wî ew kire bin çengê xwe yê çepê, wegna li ber têxte radigerî.

Mêxlîm careke din bang kir, got:

– Nîv ro ji te ra hebis!

Wî bi guhê Hemê girt, ew bi xwe ra kaşkir bir, kire odayek piçûk ya ku bi ser dersxanê va bû. Edeke wegna

hewû. Mêxlîm bi dizkî wezifê dida çend telewan. Ew mîna ku ajan û berdevkêñ mêxlîm bûn. Wezifayê wan ew bû, ku li nav gund û malan bigerin, guhdarkin, ka kî bi kurmanci dengdike. Wana navê telewêñ ku bi kurmanci dengdikirin didane mêxlîm.

Di tenefusê da, Gelho çû ber pencera hebisê, bange Hemê kir û got:

– Hemo, ez im, Gelho. Xwe pê meêşîne, va ji ya derbasbe. Mêz ke, ez çend şekirê lêmunê di qula pencerê ra diavêm te. Ezê bi nîvro, ji paydosê şunda li ber mektewê, derîya te çavkim.

Hemê mirûz bitahlkiribû, dev û lêv giwaştibû, xwe nure serhev kiribû û di quncikê odê da runıştibû.

Mezinê gund, dê û bavêñ telewan, pirê wan, xwendin û nivisin nedizanîn. Dîsa ji, wana qimeteke mezîn didane xwendinê. Ji mêxlîm ra pir hurmet dikirin. Xwarin û vexwarina mêxlîm li ser wan bû. Her ro malekê ew dawet dikir.

Mezina vi piçûkan ra digotin, „Bixwînin, bi meriyê çê win“. Hena ji digot, „Bixwînin, bi mexlim win“. Di malan de, li kurika xistin edet bû. Lowma, lêxistina mêxlîm bi wana bibed nedihat.

Xelkê gund di emrê xwe da mektewa kurmanci, elîsba û kîtabêñ bi kurmanci, qe nedibû. Li ba wana, ku mektew û hêwişin tenê bi zimanê tirkî tewê.

Zivistanê barkiribû û bihar gîhêştibû nîvi. Heyamê xweş wûn. Ji çiyêñ gund ên reş bêtir, her der hêşin xay dikir.

Hemo di sinifa çaran da bû. Lê ew her çû ji mektewê vi dûrdiket. Rokê

deçû du-sê nedîçû. Ew êdin bûbû qaçaxê mektewê.

Rokê, mexlim çend telewên gir û bi quwetbijartın û şandin pêy Hemê. Wî got:

-Herin, Hemê biwînin, li ku derê tewe ma biwe, wî bigrin bi zorê bînin.

Koma telewa haziriya xwe kir û vi rîketin. Gelho xewer zu gihandibû Hemê. Hemo derketibû jorî gund, li ser girê darê rûniştibû û çavdikir. Gund li ber nigêñ wî bû. Ku ajan û berdevkêñ mëxlîm ji kijan axzê da bihatana, wî ewê bidîyana. Li paş gir, çiyayê gund bilind dibûn. Hemê dil hewû, ku xwe biavê ta pişa çiyê.

Wexta ku telewê mëxlîm ji Hemê va xaykirin, wî xwe mina cikê gihandê pişa çiyê û li bin zinarekî gir mewzî girt.

Wî ji jor da, bi këfkonî kevir berdidan telewan. Her ku kevirek diavêt, di dû ra dikire wêrînî û ji dayik û makêñ wana ra şorêñ neçê digotin. Kevirê ku wî diavêtin, wexta ku li kevir û zinarêñ din diketin, çîng û çîng deng derdixistin.

Wêrinîya Hemê li çiya û nawala diket û şûnda vedigerî. Bi dengê wî û bi çînge-çîng kevira va kew, kergû û ruvîyêñ çiyê dihevrabûn û ji tirsa ra şûna xwe guhêrin.

Hemberîyen Hemê mëzkirin, ku ewê tu avilê nekine, dev ji Hemê berdan. Ew neçar man û vegerîyan gund.

Wexta ku Hemo ji çiyê daket û hate deşte, Gelho xwe gihande wî. Bi xwe ra, qozîyek nan i bi rûn û penir ji Hemê ra anîwû. Hemo bi hatina Gelhê pir şah bû. Wana dest di suyê hev ra birin û li van deran gavekê awere bûn. Ew bi moz û pîrik listin. Wana mozekî ser sor girtin. Perikê wî yêñ direj qetandin û deziyekî

zirav tê pişa moz girêdan. Paşê ew li quleke pîrikê geriyan.

Gelho devê xwe nêzike qula pîrikê kir û got, „Kurrr...kurrr...kurr...“ Bi vî dengî va, pîrik bi lez hate ber derîyê qulê, lê dernekete der..

Hingê, wana bi dêzî girtin û moz berdan qulê û bîstkê çavkirin. Bi hev ra wer digotin:

- Niha, moz gihêste oda pîrikê û silav dayê. Pîrikê ji moz ra xwarin çekir û qehwe qeland. Wana nan xwarin û qehwe vexwarin. Paşê moz hate kêf û li suyê pîrikê nîst.

Niha, moz pîrikê dide ber xwe û tîne...

Bi van gotinan va, wana dezî girangiran berve jor dikşandin.

Moz pîrik ji qulê derxistibû. Wî bi derziya xwe tê paşila pîrikê ra kiribû û lêm vi ser xistibû.

Gelho hema devê qulika pîrikê bi kevirekî girt, ku pîrik şûnda danekewê.

Hemo kevirek heyna pê li pîrikê xist, ew pan û puç kir. Xun û lêma pîrikê pişki dest û rûyê wî. Bîza wî jê va hat. Hundirê wî lihevket. Ew bi ser pîrikê da versiya.

Hemo û Gelho êpî awere bûwûn. Ew pir vi derengî ketübûn û bi nîvê şevê hatibûn mal.

Hemê bi şev di xewnê da dibû, ku beranekî kel dida dû mëxlîm. Berêñ ji par ra tê mëxlîm heldida. Nig ji bin mëxlîm deşün, ew li ser pişte, mîna kundirekî li herdê diket û wêrinî wî ser diket.

Di xewnê da, dengê Adulê dihat.

Wê digot:

- Hemo rawe, wexta mektewê hat, here mektewê, bixwîne û bi merikî çê we!

# KANLIKİŞLA

*Orta Anadolu Kürtleriyle ilgili anılarımın öyküleştirilmiş halini, gerçekliklerine bağlı kalarak yazacağım. Şahıs isimlerinin bazlarını ve yer isimlerinin aslına bağlı kalacağım. Zevkle okumanız dileğiyle...*

*Sükru Gülmüş*

Kim Urfa'ya "Şanlı", Antep'e "Gazi", Maraş'a "Kahraman" demişse; Koçhisar'a da "Şereflikoçhisar" demiştir. Sanki Kurdistan'ın ve Türkiye'nin diğer il ve ilçeleri "şansız, gazisiz, korkak ve şerefsizmiş" gibi bir durumda ortaya çıkıyor. Ama yukarıda Allah, aşağıda devlet-i ali vardır. Onun her dediği "Allahın dediğinden önce" olur. Yeter ki o buyurmasın. Akan sular bile durur.

Şereflikoçhisar'ı önce duymuştum. Ama onun merkez köylerinden Kanlıkısla'yi edebiyat öğretmenimiz Seyit Alp'in orali olmasından sonra duymuş ve görmüştüm.

Her senenin yaz aylarında; herkes memleketine gider, tatilini yaparken, ben yanına bir arkadaşımı alarak, yeni bir gurbet yolculuğuna çıksam. O sene Kızıltepe'li arkadaşım İdris ile Ege'nin incisi, İzmir'deydik. Nereye baş vurmuş sak kovulmuş, üstelik bazi yerlerde dayak bile yemiştik. En son Mezarlıkbaşı/Havra sokakta kahvede komi olarak çalışmaya başlamıştık. Ben dışarıdaki müşterilere, arkadaşım içeriye bakıyordu. Kahvenin önünde şoförlerin çay paralarını ödememek için bardakları diplik ve kaşıkla beraber yok ettiğini gördüm. Bunun üzerine değnekçiyle kavga ettim. Ve arkadaşma;

— Artık çalışmayaçağım. Ben okula gidiyorum.

— İyi ama daha okul açılmadı. Nasıl yapacaksın o zamana kadar?

— Sen bana biraz para ver. Ben birşeyler yaparım.

Kararımı vermiştim. Gidecektim. "ama nereye?" sorusunun yanıtında vermiştim. Hedefim Kanlıkısla, ikamet Seyit'lerin eviydi. İlk kez gidecektim. Ama "Arayan bulur/Mevlayı da/Belayı da/Olsun/Aslolan aramaktır ya/Bulunan ha Mevla/Ha bela olmuş/O kadar da önemli değil." Ve hence; bir Kurt birini sevmeyi görsün. Çıkarır ya onu yüreğine koyar yada çıkarır yüregini verir. Ondan sonra yüreksiz yaşanır mı yaşanmaz mı? Onu asla düşünmez.

Egenin incisi İzmir. İklimi yumuşak, insanı demokrat yapılı, yeri Kürtlere en sert granit kaya oluyordu. Kürtler, TC. Yetkililerin gözünde potansiyel tehlike oluyordu. Nefret ediyordum beni, varlığımı ve Kürtlüğümü kabul etmeyen her şeyden, her yerden. Onun için Cigerxwin'in "Minnetli cennettense, minnetsiz cehenneme, serbest ve azad olarak giderim" sözü temel felsefemdi.

Uyur-uyanık bir halde Şereflikoçhisar'a geldim. Ama Kanlıkısla'ya nasıl gidecektim? Onun hakkında hiç bir bilim yoktu. "Sora sora insan Bağdat" bile bulunurdu. Bende öyle yaptım. Sordum. Bana "aha şuracıkta" dedi taksi şoförü. Bende „O zaman beni

Kanlıkısla'ya götür" dedim. Valizimi alıp bağaja attı. Git, git, git hala Kanlıkısla görünmedi. Ben içimden yakası açılmadık ne kadar küfür biliyorsam, hepsini sıraladım şoföre. Ben, İzmir'den 150 lira ile çıkmıştim. Yüz lirayı pantolon cebimin zulalı yerine saklamıştım. Taksici, eliyle koymuş gibi, beni Seyit'lerin kapısının önünde durdurdu. Adama usulca yaklaştım.

-Borcumuz ne kadar kardeş, dedim. O, bana sırtarak;

-Sen için bir yüzlük olsun.

Yüzlüğü duyunca; başından kaynar sular dökündü adeta. İzmir'den Ankara'ya 30 liraya gel, ama Şereflikoçhisar'dan Kanlıkısla'ya "bir yüzlük" diyor adam. Can simidim gibi sakladığım parama elimi attım. İçimden "aman bir rezalet çekmasında, ne olursa olsun" diyorum. Bir muska gibi yaptığım yüzlüğü, adamın eline koydum. Eline sıkarkende "senin yaptığındı insanlık değil ama seni bu insanların suyu yüzüne veriyorum" dedim. Bunu der-demez parladı. Bağırııp çağırmağa başladı. Bunun üzerine, sinirlerimin telleri koptu. Bir yumruk adamın alınının ortasına indirdim. Ardından, evin önündeki ibriğe elimi attım. Ardına verdim. İcerden adamlar çıktı. Aramıza girdiler. Ben kendimi tanittım. Seyit'lerin misafirliğine geldiğimi söyledi. Ben bunu der-demez beni içeri aldılar; valizimi getirip beni baş köşeye oturttular.

"Seyit Ankara'dadır" dediler. Ben normalde çok üzülecektim. Ama bu olaydan dolayı sevindim. Bu insanlar; her ne kadar dillerinde bir farklılaşma olmuşsada benden, halkımdan bir parçaydılar. Daha söylemeden yemek

geldi. Ardından çaylar demlendi. Tütünler sarıldı. Biranda kendimi evimde, memleketimde hissettim. Karnım doydu. Çayları yudumlarken, katar katar duman yolladık içigerlerimize. Ondan sonradı söyleşti. Bir yaşlıca amca;

- Kurban olduğum neden bize derdini söylemedin. Seyid'in misafiri bizimde misafirimizdir. Ben önce anlamadım,

-Nasıl yanı?

-Şoför, parasını vermediğini söyledi. Onun için kavga etmişsiniz!

-Nasıl olur? Serseri adam benden yüz lira istedi. Bende verirken "senin yaptığı insanlık değil" dedim.

Odada bulunanlar küçük dillerini yutacaktı adeta. Yanındaki gençte "amcalardan da para aldı o şerefsiz" dedi. Artık ben o gece adeta bir Hint tarkanlı yataktı sabahladım. Akşam kafama koydum. Şereflikoçhisar'a gidip o şoförü bulacak ve kesin vuracaktım.

Köylüler benim bu niyet ve düşüncemi biliyorlar gibi beni bir an bile yalnız bırakmadılar. Çubuk Barajının olduğu köylerin üzerinden traktörle yola bıraktılar. Beni barajın önünde bırakıp "burdan her saat Kaman'a vasyıt bulunur. Oradanda Kirşehir'e gidersin" dediler. Akşama kadar bekledim, hiç bir araba gelmedi. Takvim yapraklarında; 1972, ayları hatırlamıyorum. Ama kesinlikle bir ramazan ayıydı. Barajın tam karşısında bir köy vardı. Bir köylü; "Hemşerim yabancısan şu üç kath evin yanına git. Hacıdır, varlıklı ve misafirperverdir. Senide misafir eder" dedi. Ben onun aksine; tam karşısındaki evi gözüme takmıştım. "Hele bir iftarlarını yapsınlar garipler, ondan sonra giderim" dedim. Ama ben daha

teklif etmeden genç bir kız; "yabancı kardeş, babam diyorki, eğer gidecek bir yeri yoksa ve fakirhanemize gelmek isterse buyursun, diyor" dedi. Valizimi alıp avlu kapısını açtım. Kapıdan içeri girdiğimde evin tüm fertleri beni ayakta karşıladılar. Sanki kırk yıldır bir dostları ve evin bir ferdiydim. Oturdum. Yemek hazırladı. Yemeğimizi yedik.

Yere bağıdaş kurup, onlara teyplerinin olup-olmadığını sordum. "var" deyip getirdiler. Bende Arame Tikran'ın kaseti vardi. Hepsini anlamıyorlardı. Ama müziğin tinisi onların ruhunu okşuyordu. Kürtük. Kanımız birbirini çekiyordu. Gece uzadıkça, söyleşimiz ve dostluğumuz arttı. Ben onlara, onlar bana hikayelerini anlattılar. Ben yaşlarda bir oğulları Urfa'da askermiş. Ne zaman isterlerse; onları alıp Urfa'ya götürebileceğimi söylediğim. Okulun adresini verdim. Sabah olduğunda beni birkaç gün daha bırakmak için çok dil döktüler. Ama ben kalmadım. Dolmuşa getirip bindirdiler. Biletimi kestiler. Bunlara sesimi etmedim. Çünkü birkaç liram kalımıtı. Öpüşüp ayrıldık. Dolmuş hareket etti. Ben şoförün hemen arkasında oturuyordum. Baktım onlarda Kürtçe konuşuyorlardı. Elimdeki kitabı kapatıp onları dinlemeye başladım. Akıma bir haylazlık geldi.

- Bana baksana şoför efendi ne konuşuyorsunuz öyle aranızda? Şoförün yanındaki;

-Kürtçe!...

-Kürtçede nasıl bir dil? Kim kullanır bunu? Bakın ne güzel Türkçe konuşuyorsunuz. Nerden çıkariyorsunuz bu kuş dilini?

- Sen ne biçim konuşuyorsun efendi. Biz Kürdüz, Kürtçe konuşuyuz. Türkçe'nide gayet iyi biliriz.

- Türkçe'nin dışında başka bir dil konuşmak yasak!...

- Nerde yazıyor bu yasak?

- Aha elimdeki anayasa kitabında.

- Ne öyle bir yasak dinler ne de öyle bir anayasa tanırız. O zamana kadar; sessiz kalan şoför, ara sıra dikiz aynasında bakiyordu.

- Bana bak esmer genç, kalibimi basarım sende bir Kürtsün. Ya aslini inkar ediyorsun yada numara yapıyorsun, deyip frene bastı.

- Ya doğrusunu söyle yada in aşağı!...

Mecbur kalıp doğrusunu söylediğim. Okulumuzdan bahsettim. O zaman şoförün yüzü çiçek çiçek açıldı. Bana gülüp devam etti.

- Hemşerim biz, o Kurdistan'ın saf köylüleri olsaydık belki susardık. Ama biz bu dilimizi taa Almanya'larda bile serbestçe konuşuyoruz. Burda hiçbir güç bize dilimizi yasaklıymaz.

Sürüp gitti ondan sonra dostluk üzere söyleşimiz ta Kaman'a kadar. Ondan sonra beni lokantaya götürdüler. Karmişi doyurdular, biletimi kesip Kırşehir'e yolculadılar.

Onbeş gün önce gelmiştim. Ama değil onbeş gün, onbeş yıl Kırşehir'li Kürtler arasında kalabilirdim. Ben artık, Kürtlerin her evinin doğal ferdi olmuşum. Herkesin bir evi, bir anası ve babası vardi. Benim onlarca evim, yüzlerce anam vardi.

6 Ocak 99/ Almanya

# HEFT BIRA

Berhevkar: *Memoste İrfan Baysal*

Cî hebû ci tunebû, di malekê de heft bira hebune. Bavê wan rokê dimire, wana ji xizanî terin xabatê. Wana kû herin xabatê, diya wana bi ducana bûye. Bi diya xwe ra dibên:

– Dayê, kû darguşê te bû lawik ala kesk, kû bû keçik, ala sor bi dadake, Bû keçik em ê verin mal. Na kû bu lawik em nêni mal.

Dayika wan rokê dergüşake xwe dibe. Darguşa wê keçik dibe. Dayik pir kêf xwaş dibe. Ji kêfa ra xwe şas dike. Ji ber ala sor, ala kesk datfine. Bira rokê li mala xwe mëzedikin ku ala kesk li darda ye, dibên birakî me yî dîn bûye. Ew ji ji bu vê nêne mal.

Pir sal derbas dibin. Va keçika mezin dibe. Rojekê keçik bi hevalên xwe re, li bin sîya darê rûdinin. Teşiyê lê dikin. Ji va keşikna yekê ba bibertikeve. Gîştik bi hev ra tikenin. Îcar bi pîstî hevdu tikevin, kê ba biberket. Herkes sond tûxe, ku min nakir. Kî bi bave xwe, kî ji bi birayê xwe sond tûxe. Va keçka ji:

– Golkî mey qun bi rix bimre min nekir.

Ji hevalan ji yek bi hêrs ji ra dibê:

– Ez te bi qurbanê heft bira kim. Tu çima bi heft birayên xwe sond naxî. Tu bi serê golik sond tûxi.

Va keçika bi girî tere ba diya xwe.

– Te heta niha çima ji min re negot, heft birayên min hene. Min li nav hevalên xwe bi serê golkî me sond xwar. Çima min ji bi birayên xwe sond nexwar. Diya keçikê mesclê

ji pêsiye de jê ra tebê. Keçik tigrî aş nabe. Dixwaze birayên xwe biwîne. Diya keçikê, ji keçike re:

– Çarek heye. Tu wana binî cih tu ê birayên xwe bibinî. Ez ê ji te re kerekê bi xweliyê çêkîm. Tim jê re bê ço ço. Mehê çus. Tere bi rê tikeve. Îcar di rê de morikê dibîne. Ji kerê re tibê çus û ker tixelete. Keçik bi suva tê mal, bi giri:

– Mindi rê de morik dî. Ji kerê re min got çus û ker xeliya.

Diya keçikê jê re kerékî din bi xweliyê çêdike. Îcar keçik li vî kerî siyar tibe. Tim jê re tebê ço. Wuqas morî, zer û zîv li riya xwe tebîne nabê ços.

Pir tihere hendik tihere, ker tê li malekê disekine. Keçik peya tibe. Tikeve hundir, ku kesik li hundir tune. Di hundir de heft cih hene. Keçik bi xwe xwe tebê va mala birayên min e. Xêni paqîş dike, şîvê çê dike û xwe vedîşire. Êvarê bira tê mal. Ku ci biwînin. Mala wan paqîskiriye, şîva van hazır e. Heft bira rutinin, nizanîn va ci ye. Ji tîrsa re ji şîvê ji naxin. Tebênen lek axû têdaye. Jibo vê pariyek şîvê bi piskê tam kirin tidin. Ku tiş bi piskê nê, êdî ew ji şîvê tuxin. Pişt xwarinê ji hevdu tipirsin va ci ye, kî ye? Yek ji van tebê:

– Yek ji me xwe li mal veşere ka va kî ye.

Berê bira yê mezin li mal timê yên din tiherin xebatê. Pir zeman derbas tibe. Birayê mezin tikeve xewê û

keçik derdikeve paqış van tike, şivê van çetike. Keçik dîsa xwe veşartine. Birayê din ten mal ku biraye mezin tiştek nedîye. Pi vî ziravî her birak li banda time tiştekî nabîne. Heta biraye piçuk.

Birayê bigûk bi derawa xwe li xewê tine. Keçik dertikeve dor baniya berav tike. Şiva van çetike. Û bira jî par re raytene guliyen we. Jê re:

- Tu in i, tu cin i?

- Ez na in im na jî cin im. Ez xwanga we me. Bira jê re:

- Tî xwanga me tune ye. Xwang;

- Wexta ku ez hatime dûnê diya min bi heycanê re, xwe şaş kiriye ala kesk bi darda kiriye.

Êvarê birayê din jî tê mal. Ew jî pê tihesin. Xwangê xwe hemêz tikin û jê heztikin. Birayê wê bi ro tiherin xebatê. Ew jî ji wan re bermaliye tike. Lê, temekê li xwangê xwe tikin.

- Xwangê, piskêke me he ye bê wê tiştikî mexwe. Ku te ci xwar nevî te nevî we. Ku te ver nekir a bi arî te da mîzke. Ari te dê vemre. Tiştî ku tu pê êr pêxî tune. Roke xwang malê rês tike. Hewik mûj li erde tiwîne. Ku bavê devî xwe pisik te bîra ve. Bane piske tike. Pisik nê. Pisik jî pi zanebûn nê. Vê ticerbine. Xwang mûjê tavê devî xwe. Pisik te bi arî vê de mîz tike. Va bê ar time. Jî birayê xwe re şunake şivê çêke. Tere derive tikeve, ku li dure tê nabera heft çiyanda dumanêk hêl te. Xwe lê digrê tihere. Ku lê wê dere sê jin runiştine. Danîkê tikelnîne. Her sê jin jî jê re:

- Lê lê lê tu hatî ci? Va mala hirçê ye. Tu hatî ci? Hirç ku ware ya te ji xwe re bike jinik. Xwang halî xwe ji wan re tebê. Ew jî bi lez kozik ar tedîn. Pêşîye we jî henek danî tikên. Berî wê tidin mal.

Keçik bi lez tê mal. Li riye tiliyê xwe li kevira tikeve xun tike. Bi gav gav xun jî lingî we tiçilke û ji pişiyê we de jî hewê daniyê, li erdê tikevin. Hirç tê mal, jî jinê xwe re:

- Bîhna insanê xerîb tê. Qat kin, kî hate vir. Ew jî, ji tîrsa ra qat dikin. Hirç dilopên xwûnê û hewê daniyan taqîp tike, tê mala vê. Hirç jê ra tebê:

- Derî veke. Keçik venake. Hirç jê re:

- Du tiliya xwe ti qullê dêrî ra derxe, ezê gustirkekê pi tê dim. Keçik tiliyê xwe dirêj tike. Hirç tiliyê wê tike devî xwe û timêje. Bernade heta ku keçik bîrva dice. Hirç cidêle tihere mal. Birayê keçikê tê mal, ku derî girtiye. Yek ti pacê re tikeve hundir. Ku xwang bîrva çûye. Jê tipirsin va halî te ci ye? Xwang her tiştikî ji van re qat tike. Heft bira tiherin mala hirç, ku bikujin. Tiherin digên mala hirç. Hirçê tikujin va sê jinan jî xelas tikin. Va jinana heytinin tê mal. Sê bira va sê jinana li xwe mar tikin. Ro tê van jinana jî xwangê vana tiqarin. Tebê em ê rêkê li vê bikin. Mûyekî hirçê tikin kûzî avê. Xwang jî kûz avê vetux. Muyî hirçê xwang ro pi ro tiperçivîne. Va jinana jî mîrê xwe re tebê:

- Xwanga we bi duçan e. Bira ku pêtihesin, tebê emê wê bikûjin. Bira ku xwangê bikûjin, xwang li ber van tigere:

- Min mekûjin, min tiştî neçê nekir. Ez ne duçanî me. Bisekinin heta ku ez zam. Hûn hingê min bikûjin.

Ro tê xwang vetirse ji zikî wê mûyik dertikeve. Perça zikî wê datê. Bira dizanin ku jinê wan lê iftera kirine. Her sê bira jî jinê xwe bertidin. Gîştek bi hev re tê ba diya xwe. Jiyana xwe bi hev re derbas tikin.

# YARANÎ/HENEK

## QELIND

Malbatek dike lawê xwe (Miço) bizewicîne, di gund de jê re qizekê dibînin. Lê, dayîka keçikê li wan re dibêje qewlên min hene. Şertên xwe ji; yarek rûn û yarek peynir e. Lîbelê de tú were wê çaxê, yarek rûn pir bi qîmmet bûye. Yarek penir zû peyda dikin, yarê rûn ra ji çareyekî wiha dibînin; nivê yarê bi çamûrê tijî dikin, serî yê wê ji bi rûn por dikin û dibin didin diya keçikê. Bi vî awayî daweta xwe dikin û bûkê tînin malê.

Roj derbas dibin, hefte derbas dibin, vê carê pismamê Miço dike daweta xwe buwe. Bayraxê dardixin, bi du-sê roja şûnda ca mêze dikin ku jinek jêlva têye qîreqîra wê ye; li juniyêñ xwe dixîye, porê xwe diçurikiniye.

Pismamê wî lêre dibê: Lo Miço, ca bindire, ev jîna ku jêlva tê ne xasûya te ye?

Miço dibê: Way limin bavo, ew gêştiye çamûrê, ez birevim.

Jordan



## TELEFON Û QÊDIR

Qadir saf, Mille ji pir bi henek e. Rokê Qadir tere ba Mille. Mille dibê: Qadir ezi herme derekê weng telefon têñ mêske. Mille tere ba cîranekî xwe û telefon dike ji Qadir ra. Dibê: Tu kî yi, Mille heye? Qadir dibê: Na Mille tune ye, ew ji hîn nû derket, tu kî yi? Mille xwe ji wa derna nakê, dibê: Ez Elik im, ji Ewropê da telefon dikime, tu kî bûyi? Qadir dibê: Oooo Ela tu yi? Tu çi diki? Başî? Ez Qadir im. Mille ji mèle Elikê da lê dipirse dibê: Mille ji min ra slav ke û xatirê xwe dixazê. Paşê Mille te û dibê: Qadir te çi kir, çi nekir? Qadir dibê: Mille, tu çing çuyî Elikê telefon kir. Mille dibê: Na lo, Elika çî ye, qey te rind nasnekirîyê! Elik li Ewropê bû û tim alqohol vedix-warîbû. Qadir tewê: Tu dîni! Ez Elikê nasnakime! Bihna reqîyê ji li dev dihat.

Mille Xelikî

## TE BÎXWE JÎ KIR, TE BI MEJÎ KIR

Wek tê zanîn li biharê hemû gundi haywanen xwe dibin zozanan. Hatîna biharê ji bi gulîlkan û bi çûcikan ve tê nişan kirin

Rokê mîrê malê radibe dibînê ku bilbilên biharê hatine, dikine viçê viç. Zarokên xwe re dibê; de rabin destpêka biharê ye. Pêz buwin zozanan. Lê heftek, du hefte derbas nabin, berfek pir dibare. Hemû pez qir û wenda dibin. Ü zarok li dû pêz digerin. Li wan yek dibînê ku çûcîkek (bilbilê) biharê li ber qulê ciyê xwe can daye. Ew bilbilê ji herdê radike û müyên wê dirûçkîne û bi hêrs wiha dibê;

Bilê, bilê min di ..... nê, te bi xwe ji kir, te bi me ji kir.

Jordan



## ŞAHİDBÜNA EHMED

Zevî hîşk dikin, genim û ce hiltînin, li şûnê sap dimê. Ji sap jî lodên kayê çê dikin. Ehmet, Heci û Hemol terin ji lodekê, kayê didizin. Vana erebeyên xwe yên remorq tijî ka dikin terin. Lê xwedanê têrle vana dibîne û dide mehkemê (dadgehê). Lê, xwedanê têrle ji Ehmed re dibê, eger tu li ser vana li mehkemê şahîdiyê bikî, ez ê te eskim. Ehmed qebûl dike. Jenderme têن Heci û Hemol dibin û mehkeme destpêdike. Hekîm ji Ehmed pirs dike,

- „Te dî kû vana ka dizî.“ Ehmed dibê: Erê min bi çavê xwe dî ku wana ka bir.

Hekîm dîsa pirs dike:

- Ehmed! Li wê demê te çi dikir li wir? Ehmed serê xwe heydine ji xwe emîn; - Qe min jî erebek ka biribû.

Li ser vê gotinê, hekîm her sisîyan jî dişîne hepsê.

*Millî Xelikî*



## MEMÛRÊ DEWLETÊ

Li gûndekî merivekî pir desteng hebû. Tenê beranekî wî yî çê hebû. Bi pera berdida ser mîyen xelkê û pê dewara xwe dikir. Di sêri da, serê mîyekê, deh lîra distan. Dûre herku diçû heqê beranê xwe zêde dikir. Li beranê wi pir berxên çê diketin. Gundiyân seva wê deng nedikirin û pê razî bûn. Lê, êdi zamanek hat, wî heqê beranê xwe pir zêdê kiribu, gundiyan hêdî nikarîbûn hewqes pere bidin. Ji ber vê, gundi çûn li dewletê gîfî kirin.

Dewletê du vazifedarên xwe şandin û baranê gundi, li dest girtin. Du kes dan ber berên ji bo ku wî xwedî bikin. Beran pir goşt girt, bi kef bû. Dewletê beranê çê, bê pere berdida ser mîyen gundiyan û tu heq li wan nedistan. Lêbelê vê carê, li dolê bêren berx çênebûn. Rusipiyên gund li hev kom bun; ka em çibikin, ci ne kin? Paşê qerar dan û gotin: Ka em ji xwedîyê berên, ê berê bipirsin, ka sebeba vê yekê ci ye?

Gundiyan yek şandin hindê xwedîyê berên. Lê pirs kirin; sebeba vê yekê ci ye.

Dewlet ewqas berên rind xwedî dike. Lê, li dola vî berx çenabin, sebeb ci ye?

Gundi got: Divê ez herim beranê xwe bibînim, li wî bipirsim, ka sebeb ci ye. Ez ê dûre ji we re bibêm.

Xwedîyê berên çû hinda beranê xwe û lê nerî, ku berên pir goşt girtiye, vegerî hat, ji gundi ra got: Hûn zanîn beranê min ci dibê? Ew dibê: Ez bûme memûrê dewletê û bi kefa dilê xwe me. Karê xwe, li gor kîf û zewqa xwe dikim...

Berhevkar: *Yusuf Özden*

## TURÊ GENÎ

Rokê xwezgîncî terin malekê ku keçikê wan bixwazin, bavê keçikê bi hatina xwezgînciyan pir şâ dibe, tu li wan tişteki pirs nake û xwe giran jî nake. Hema keçika xwe dide wan.

Xwezgîncî giştik şaş dibin. Piştî ku şerbet vexwarin û şiranî xwarin bi şûn de, li bavê keçikê dipirsin: Apo, sebeb şî bu, ku te hema keçika xwe da me?

Bavê keçikê got: Lavê min, wexta ku keçik di mala bavê de qert bibin. mîna turê kufîkî,

li milê meriya dalqandî dimînin. Çiqaş ew bîminîn genitîr dibin.

Îcar merî wî tûrî çiqaş zû jî milê xwe daxîne, û bi milê hevalê xwe ve daleqîne çêtir e.

## MIX

Carekê xortekî kurd û xortekî tîrk, hevalê hevdu bûne. Xortê kurd tim xwe dipesinîne, ku méraniya xwe pê bide qebul kirin.

Rokê xortê kurd li yê tîrk re gotiye, niha ez dikarim mixekî bi serê xwe di vî dîwari de bikutîm û derbazî aliyê din bikim. Xortê tîrk, lê bawer nekiriye û gotiye: Tu nikarı.

Li ser vê, bahîs girtine û xortê tîrk çûye mixek, li wan mixên dirêj anîye. Xortê kurd ew mixê dirêj daye ser diwêr û bi serê xwe lêxistiye, sê çar caran lêxistiye, lê mix derbas newîye. Xortê kurd ecêbmâyî dimê; çîma ev mix nariyê. Tere li alîye dîwêrê din dindire, çi bibîne; ku kurdekî din paşve serê xwe dayê ber diwêr, nahêle ku mix heriye.

## ZERÊN DEWLETÊ

Yekî desteng kûpek zêr dibîne. Wan zérana giştikan dike tûrekî û li kera xwe dike. Ew û jinika xwe, li paş hev li kerê sivar dîbin û berê xwe didin seraya paşê.

Nobetçî xeber dide paşê ku mîrek bi jinika xwe ve hatine ber derî û dixwazin paşê bibînin.

Paşa izinê dide, ku ew derbazî hundir bibin.

Merivê seqir ji paşa re dibê: Paşayê min, min kûpek zêr diye. Ew zêr, ji min re heram in. Malê dewletê ne. Min ev hanîn, ku teslimî te bikim.

Paşa pir şadi dibe. Fermane dide, dibê: Wan zérana bibin mala min. Paşa, jinika mîrik jî lêdistîne, dike malê dewletê û li birayê xwe mar dike. Kera wî jî, li sarayê dike wezîrê xwe û mîrik jî li wir dide ger.

## CIVINA OSMANIYAN

Paşayekî Osmaniyan, rokê civînek mezin, bi rûsiî û wezîrên xwe re çedîke. Civîn heta derengiya şevê dewam dike. Xanîma paşê li malê bi tenê dimîne, ditirse. Hema radîbe tere civînê û dibêje: Paşa, paşa, zû rave, were mal. Diz ketine mala me. Paşa, ji xanîma xwe re dibe: Xanim, belkî tu tîrsîya, yan jî qiratiyek hat ber çavê te. Tiş tîne, here mal.

Jînik disa dibê: Erê welle, diz ketine mala me, zû rave, were mal. Paşa dibê: Xanim, ne va ne, diz tevda li hindê min in. Min derî li wan girtiye. Ma diz li ku mane ku werîn, mala me kevin?

Berhevkar: Yusuf Özden

# Teklifa bê fedî

*Yusuf Yesilöz*

Sala 1971a bû, pişti ku leşkerên Tîrkiyê disa cuntayek çekiribûn, mîrê Zeva Reş, Hecî, çûbû Elmanyeyê. Hecî, bavê pir zarokan bû. Hejmara wan ya wê demê nayê bira min. Lê niha tev hev yanzdeh keçik û lawikên wî hene. Wî alikariya xwendevanê zaningaha ODTU, li Enqerê dikir, yên ku dixwastin şoreşkeke mezin li Tîrkiyê çêbikin. Ew yeka çûbû guhêñ devletê. Bi şev û roj leşker li her cî, li wî digeriyan ku wî bigrin û bavêjin zindanê. Hevalên xwendevan ji Hecî ra rîwîtiya Elmanyeyê amade kiribûn û Hecî karibû bê mesref biçê Elmanyayê.

Ez nexwazim iro ji we re qala wê bikim, ji bo ci leşkerên Tîrkiyê disa cuntayek çêkiribûn. Lê mixabim ew meseleyeke dûr û direj e. Ez dixwazim bi tenê qala Zêwê û sohbata wê ya balkêş a bi ciranê wê, Mille re bikim.

Hecî sê sal bûn çûbû Elmanyayê û hiç nehatibû mal. Carekê tenê xeber û ji zarokên xwe re ji cilên ewropayê şandibû. Meriyek ji gundê Cûtka ji Elmanyayê hatibû izinê. Hecî ew tiştana bi wî ra ji malbata xwe re şandibû...

Zêwê bi zarokên xwe tev hev li warakî biçûk, nézikî meriyên Hecî, dijiyan. Wexta Hecî çûbû, wan meriyan Zêw û zarokên wê biribûn cem xwe ku wana biparêzin. Zêwê êdi ketîbû bin parêza wan. Ez nexwazim iro ji we re bêjim, ew parêza pêwist bû yan ji na, ji bo ku ew meseleyeke bi serê xwe ye û

dûr û direj e. Wek hat gotin, bi tenê ez dê ji we re qala sohbata di navbera Zêwê û Mille da derbasbûyî bikim.

Meriyên Hecî devlemend bûn. Keriyê xwe yên pêz, hespêñ wana yên kehil, erden xwe yên fireh hebûn. Keçikêñ wan pîr bûn. lê bi tenê lawikekî wan hebû, navê wê ji Mille bû. Minak em dizanin, navê "Mille" ji Kur'an-î Kerîmê tê. Lê ti elaqaya (peywendi) Mille bi Kur'anê tunebû, bi tenê navê babîrê wî Mille bû. Çend mehan pişti bûyina Mille, bapirê wî navê xwe lêkiribû, dixwast ku torinê wî navê Mille bide jiyandin. Mille leşkeriya xwe xelas kiribû. Simbelê wî mina şivê bûn, dikarî bê alikarî riheñ xwe kur bike û bibiriqîne. Lê kemasiyeke wî tenê hebû; ew li wa salêñ xwe, hîn nezawicibû. Hevalên wî giştik zewicibûn û bavê gelek zarokan bûn. Hetta hetta bavê zarokên li çaxa dibistanê bûn. Mille ji ber wê yekê dîn dibû.

Jin nedîşna Mille ne ji bo malbata wî bû, ne ji bo ku malbata wî navekê xwe yî xirap derketû bû; sedem bi tenê ew bû ku Mille lê dima(kekeç). Ew disa dibe meseleyeke dûr û direj eger ku ez ji we re qala wê bikim, ji bo ci kesek keçikêñ xwe nadîn mîrê kekeç. Baştir e ku ez bêm ser sohbata Zêwê û Mille.

Zêwê pişti nimêja nivro li siya xaniyê xwe yê tekgoz (oda) runiştibû. Mille hate

ba wê. Wexta wî dît ku Zêwê bi xwe de ketiye, ji wê pirsî ku ecep derdên wê hene yan ji kesekî dilê wê êşandiye.

"Na" got Zêwê, "ji bo ku gavan manga bibe çêrê ez iro berî berbangê rabûm ser xwe ku wan bidoşim, Ji bo vê ez pir westiya me."

"Wan mangana du her roj di ber berbangê didoşî. Heta iro her dem rihêkî te yî bi ken hebû, lê tu iro pir xemgîn i.

Zêwê careke din ceriband ku Mille ji ser xwe jê xelas bibe û got ku zarokan nehiştine ew rokeve.

Bersiva Mille disa hazır bû:

"Xaniyên me pir nezikî hev in. Eger zorakên te bi şev bigirîvana me ji dibihist û diya mina ku tu mina keçika xwe ya mezin kırı dilê xwe, yabihata û ji te bipirsiya; zarok ji bo ci digirin. Bêje Zêwê, derdê te ci ye?"

Zêwê ceribandina dawî kir:

"Ganê manga min ê ku ez ji zarokên xwe re didoşim iro sibe hişk bûn. Ez ditirsim ku ew ji mîna manga min a sala çûyi ku mîr bi gana girt û kuştibû, bimire û em bê şîr bîmîn!"

"Lê, hingê tu ne mîna iro bi xwe de ketübûyî. Diya min li te pir bi hêrs bilbû û tu rezil û rûsва kiribû. Tu ji bo mirîna mangê qet negiriyabûyî. Te gotibû "ma xwedê li cihê heywanan zarokên min biparêze!" Te goş qelî kir, paşhingê sê mehan kiribû nav xwarinê!"

Milleyê kekeş dest ji Zêwê berneda. Zêwê ya ku bi henekên xwe navûdeng bû tiştekî din ceriband. Ez baş nizanim, ew gotinênu ku wê ji Mille re kirin rast bûn, yan ji wê yaranî bi wî kirin. Mille li hemberê wê li ser baliveke runiştibû û li benda bersiva Zêwê bû. Zêwê destpêkir:

"Tu bi xwe dizanî, mîrê min sê sal in çûye. Ew li benda efa dewletê ye, lê ef ketiye strûyê kerê. Ez ji ber tenêbûnê eciz bûme û dixwazim bi mîreki baş re birevim. Tu dikarî ji min re alikarî biki?"

Mille carekê xwe paşa û carekê ji pêşda xar kir. Qutiya xwe ji baxir (mis) ji beriya xwe derxist, cixareyeke qelew mina tiliya xwe yê qalmûskê piça. Ew bi hestê xwe yê mis vêxist. Bêhnakê kûr ji kişand, dûman bi kêf berda hewayê û bi intê intê (zimanêki ku li dime) dest bi gotinê kir:

"Ez pir mîrên nezewicî nasdikim. Lê ji wan bi tenê sisê li gora hemdê te hene..."

Mille çavêن xwe berdane ser Zêwê û dom kir:

"Hesenê Memê hîn nezewîciye. Eger ew teklifa te yê zewacê bibilize, ewê li ser baskê teyrêkî bifire û bê ba te ku xwe bi te bide naskirin. Ew insanêki pir baş e, lê, heta iro kesekî keçika xwe nedaye wî. Ew dê ji bo te baş bibe. Lê, kemasiyeke wî tenê heye; çavakî wî tune. Berî ew biçe eskeriyê giha diçinî û kirsek kete çavê wî û çav kor kir. Hingê piraniya gotin ku Hesen ew kirşa mexsûs kiriyê çavên xwe, ji bo ku ew neşe eskeriyê. Lê ew meseleyekê din e... Ji bo wê ji ez wî bi dilê xweş pêşniyar nakim. Berî giştê em merivê hev in.

Mîrê duwemin Millê Osman e. Ew ji bo durustiya xwe bi navûdeng e. Eskeriya xwe ji kiriye. Malbata wî heta iro ji wî re li keşikek geriyan û nedîtin. Kesekî keçika xwe neda wî. Ji bo ku Mille, heta xortaniya xwe, bi nivinan de mîz dikir. Ji bo wê ez wi ji tewsiyê te nakim. Ji rindiya te ra gune ye.

Mîrê din ji, Umê Hecibesê ye. Umê hinekî mezin e. Wexta mixtarê günd, Usiv cibû rehmete, ew bûye. Ew sîh sali

ye. Berî ku ew biçe eskeriyê, ew bi hûnera xwe ya suwarî û mîrxasîyê, bi navûdeng bû. Hingê ew ji hespê xwe yê kehil de gêrbû û niha dikule. Ez wî ji ber vê yekê ji te ra pêşniyar nakim. Berî giştikê, tu di bin parastina me da yî.”

Zêwê mat mabû û li Mille mîze dikir.

Mille got, ”Zêwê, eger tu bi rastî mîrekî baş, nêzîki xwe dixwazî, ez ji li vir heme!” Paşê Mille serê xwe kire erdê, minak adetî bû.

Zêwê li Mille mîze kir, bi lez û bi dengekî bilind got:

”Wê deme ez bi te re ji, nazewicim. Ji bo ku tu lê dimeyi û navê te derketiye, keseki heta iro keçika xwe nedaye te!”

Mille rabû ser xwe, rûyê wî bi temamî sor bibû, xwe da ser riya mala xwe, kire piste pist û di hundirê xêni de wendabû.

Winterthur, 24.11.1999.

Xwendevanê birêz û delal, em careke din gazî hemû kurdên Adatolîya Navîn dikan, ku besdarî berhevkirina folklorâ kurdî bibin. Daxwaza me ew e; ku her xwendevanek bikaribe *Bîrnebûnê* bi çîrok, metelok, gotinê pêsiyan, mamik, serpêhatî û bîranînê xwe dewlementtir bikin û hem ji folklorâ me ji wendabûne biparêzin.

Hûn dikarin nivîsên xwe li ser navnîşanê *Bîrnebûnê*, yan ji bi riya posta elektronîk, e.mailê bişeynin.

**Navnîşana li Swêdê:**

Box: 3318, SE 163 03 Spånga / Sverige  
Telefon: 0046-(0)8-761 81 18  
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90  
E-Mail: apec@swipnet.se  
<http://home.swipnet/apec>

**Navnîşana li Almanyayê**

Postfach 900348, 51113 KÖLN/Almanya  
Telefaks: 0049-(0)2203-301630  
E-Mail: [birnebun@hotmail.com](mailto:birnebun@hotmail.com)  
<http://birnebun.subdomain.de>

# XEVNA WELATÎ BERÊ

*Dr. H. Mikaîlî*

Ez di treneke elmanan da me, ê ku di saetekê da bi 150-200 km tere û meri dîsa jî li bala wê nawe. Ez çavên xwe digrim. Jiyana min a berê, a li welêt mina (note) şerîda filmekê li beri çavên min derbas diwe. Ez bir dikim ku li Elmanyê me, ez hendu ne di trenê da me, li hela min, li hember min tu elman rûneniştin e, ez qe(t)naherim ferqiyê wan.

Nika, ez li gundi xwe me, li Mikaîla, Mikaîla gundeki Enqerê, girêdayiyê Polatliyê ye. Dem dema havinê ye. Xermani, zîyan (zewi) têne çinandinê. Ez xwe li ser lodek tomanê direj dikim. Bîna tomanê ku hîn nû hatiye çinandin, tê poz û bivîla min. Vê bînê dikşînim, dikşînim,kuur dikşînim kezewa xwe ya spi. Min çiqas jî bîra vê bîhnê kirîye. Lo qe meri bîra tomanê jî diki?

Bi Xwedê! min kirîye, Poz û bivilên min kirine. Ez li ser tomanê, çavên min li stérka, dikevîm xeweke xaş, xeweke kûr. Û xevnekê diwînim. çend salen ku min qe xevn nediti wû. Ez di xevna xwe da li gaza Sêbirê me, li Sêbira av şekir, Sêbir, zozana xalanêñ min. Bi lawi xalî xwe yî Omer, bi Nêmiq va pezî wan diçerin. Li derva li bin esmani bi

stérk bilxura (dan) şivanki dikelin. Di kulêv (keçe) da radimedîn (radizên). Bi sermayê bayî siwê (sibê) eşkere diwin. Qırş û qala berhev dîkin û bi çaydanî ku ji isê, jî dû reş bûyi, çaya siwê vedixwin. Li hêlê çayê runê kal, tomasta bi reşreşik û nanî tirş dixwin. Ez ji wir radiwîm û xwe nişkava li bîra sîqo diwînim. Eee ez heta vir hatime, qe xatîrî avê bîra sîqo dihêlim. Ava bîrê sîqo, weqas sare ku ê kevira bicemidîne, weki şirîne, mîna hinguv e. Hîn ji wê şîrintir, hîn jî wê sartir qet tiştek li dinê tunne ye. Ez xu (xwe) li ser zik dirêj dikim û bi dêv dikevîm avê, têr têr jê vedixwîm. Bi vê avê zikî meriya temel naperçive. Kî dimire? Kî dimîne?

Ew diwe kû ez careke din jî di xevna xwe da bîra sîqo newînim. Kî dizane? Belkî ez ji vê wêda hîn qe jî xevna newînim. Tehma xwe, jî avê bîra sîqo hildigrim. Ji wir da radiwîm, terim. Gîrî Sor, demekê li ser vir rûdînim û li gund mîzedikim, sêr dikim. Hîn pir şûn hene li benda min. Diherim Bîvîlê, dike hîn herim Maxrê û Kanîya Moda. Kanîya Moda cenneta dinê. Her der heşini, jî erdê av dizê, di nav avê da masîyêñ

reng bi reng mîna xaliyê dikelin. Li wir xwe davêjim ser çêrê û rûdinim. Ro mëjîyî serî meriya dikelîne. Ew germekê ji dîn derxistinê ye.

Bîna çêrê, pêçekê, gulgupika her der girtiye. Jinênd gund li ser Kaniyê Moda kincea dişon, hînek jî danuga (bilxur) dikelînin. Cîran gî piştgirîya wan dikin. Zaro hemêz hemêz tomenê ji danuga ra dikşînin. Û nav xwe da dikevin îddiê, ku sîtila kê ê peşta bikele. Ji kêleka çêm hînik tûzik û mendikê jêdikim. Ji jinan naneke hişkeva, nanî ku hîn hînnû li ser sêlê hatîye birjandin, distînim û wana dikim qozi. Bi kêfêkê, bi iştîhekê pariyekê gir ji wê gesdikim. Dengê teyran, dengê beqan, kir kira Hespan, arînîya keran, orînîya mange û golikan têñ guhê min. Ee naxira Mikaîla bê Bellik diwe? Bellik bê klam bê stran diwe?. Bellikî Mehko, Mehkoyî Aşıq, stranêñ wî hîn qe li derikê nehatinê gotin.

Zaten Bellik jî va kilamana berê qe ne strandî bûn. Nika li vê demê, li vê angê li hev danî bû. Dengî wî veqas şewitî bû ku, du çîlk grî ji çavêñ min berjêr bûn, hetanî ser lîven min hatin. Du hêstirêñ bi xwê , ên bi hesreta Welatî Berê barbû yî.

Ez ji wir jî rawûm. Hîn gelek şûn hene li welatî min, li gundî min ku, ez di vê xevnê da lê bigerim. Bazara ku min li jor jî qalê kirî bû, kî dizani belkî va ya xevna min a dawiyê ye. Nişkava bi dengî elmanêkî va divenciqim.“ Darf ich bitte durch? „, Mêrik dixwast ku ji trenê dayê. Min çîpe xweyî dirêjkirî, kişandin û ew

derbas bû, ji trenê peya bû. Nika ez û Elmanî ku li hela min rûniştîye, em tenê di kompartimana Trêne da man. Bi hêvî(umuda) ya dîtina xevna welatî berê min disa çavê xwe porkirin.

Le belê xew neket çevêñ min. Dengê radyoya Kôlnê bihîst. Di vir da dihat pêşkeşkirin ku;

Ecevît gotiye;“Li Tirkîyê pirsa Kurda tune ye. Eger hewû ya, ê li Heymanê ji hewû ya.“ Ez bi vê şorê vî mîna ku di tînda hatiwûm lêxistin. Dest û ningên min dihezîyan. Heşê min ji serî min çûn. Her derê min tevizî. Ji hêrsa, ji bê çarêtîyê. Eze bersiva vî kuçikî ning şewitî, sîngselekî dev bi xwîn çito(çawa) bidimê. Eze çito jê ra biwêjim ku, em bi sedsalane ku li Heymanê,ne û tim Kûrdîn. Hûn me bi listik û dolabêñ xwe ji kurdîtiyê şenakin bi dûrvabixîn. Ji welatê me yê berê şenakin biqetînin ,raçikên (tamar) me çend sedsalin ku bi Welatî Berê va girêdayîne. Ava xwe ya jîyanê em bi vana ji welatî berê vedixwin.

Her Kurdekkî Heymanê, Anatoliya Navîn, Şexzinî û Kurmanc di xevna xwe da tim Welatî Berê diwînin. Ew xevna, xevna kalî min bû, a kalî kalî min bû, ez jî diwînim û ê ji hêla zaroken me da jî were dîtin.

Va xevna ji berê da hatiye, ê heta dawiye jî here. Li Heymanê qe gundek tune ku, li ber diwar

û odan da qala welatî berê, qala meri û binyata berê neyê kîrinê, neyê pirskirin.

Qe hewîdar nebe sinselegî reş Eco. Ew xevna, ne notê xevnâ te û ên hevalên tene. Ew xevnana ne bê bingeh û bê bawerî ne.

Tu yê vê xevnê xwe, ê ku tê da kurd giştik bûne tirk, carekê biwîne. Em xevna xwe hertim diwînin. Bîhna Welatî Berê qet ji pozî me der neket û der jî nakeve. Kuçik bavî Eco û ên wekî wî nave gundêñ me guherandin, qisekirina kurdî qedexe (yasak) kirin, navêñ zarokêñ me ji navberê rakirin.

Bi wayê xwestin ku em hendi xevna Welatî Berê newînîñ û zarokêñ me jî rokê esl û binyata xwe îñkar bikin. Lo bi ser navi Xwedê, vana bi serpiya va dîn in, seme ne, heşê xwe bi kayê va xwarine. Lo vana nizanin kû li Heymanê navê her kevir, çîya, bani, gaz û newala kurdî ye. Lo vana hewce ye ku navêñ va derana giştikî biguherînin û li ser her derê mina ku li navî Gundî min kirine, lewhayeke bi navêñ tirkî bikutin.

Ez bixwe xwe û Kurdêñ Heymanê giştika îhbar dikim. Lo werin navê Bivîlê, Maxrê, Kanîyê Mala, Kaniya Sili Qînto, Kanîya Moda, Sêbirê, Girî Sor, Qirê Bellê û Kurê Eftêr jî biguherînin. Buhayêñ lewhayêñ tirkî ji beriya min da, ji kisi min da. Lo va bê namusana, bê bêxtana bê wenatekî berê ne. Vana

meriyêñ bê xevnin. Ew na ji va tiştana bê xeberin. Ez bi dengî wolkmenê Elmên bi yek da venciqîm. Elmên çavêñ xwe li min, ziq bibû li min mîze dikir. Le belê tu manek ne didayê ku ez çidikim, çîma di trêne mîna bêheşan ci xet (Kaxiz) ketiye destêñ min li ser vana bi lez û bez dinivîsinim û dinivîsinim.

Ez ji vê xew û xevnê rawîbûm, le belê Bîhna tomanê, çêrê, tuzikê, mendikê û Danugan hîn jî di poz û bivîla min da, denge Bellikî Aşıq hîn jî di guhêñ min da bûn.

## Ferhengok

**Sor:** Laf

**Tînda lêxistin:** Çarpılmış gibi

**Hewî:** Umud

**Merî:** İnsan

**Jîyan:** Yaşam

**Welat:** Memleket

**Bawerbûn:** İnanmak

**Lod:** Saman yiğimi

**Zozan:** Yaya

**Rune kal:** Tereyağ

**Veneîqîn:** İrkilerek uyanmak

**Danug:** Kaynatılmış Bulgur

**Sinselek:** Kartal, Akbabâ

**Raçik:** Damar

**Reşreşik:** Çörek otu

Ew hikaye (kinçirok) bi devokê Anatoliya Navin hatiye nivisandin ku bira (Bila) karaktera vê devokê ji dinê, ji navberê wenda nebe.

# ÇIROKA GURÎ\*

*Curukî*

Guri çûye hinde hut  
Tî û birçî canî rut  
Serhevra bû ye bulut  
Li mîl jêke çerm û purt

Çû hut ra bû bişqorî  
Hut xizan kirin gorî  
Tim waja kirin berî  
Gundi rabûye serî

Hut guri va girtin bahs  
Cot ajotî bi hewes  
Hut mîlén jékir kiras  
Beder berba-ka badas

Lo kî li kê suhatî  
Mil jekîn çerm û taşî  
Ketî bejne qenc petî  
Kî çûye ew nehatî

Lo guri cot hûr bajo  
Hedî here kûr bajo  
Tajiyê min ku mexel hatî  
Dîsa here wir bajo

Berf barî xwe cil meke  
Diranî xwe zîl meke  
Beroşê mast qul meke  
Kîpikê kûz şil meke..

Guri sevi bê xadî  
Şarêñ hut kirin kedî  
Dinye wali tişt nedî  
Neynîkê datim xwe dî

Ga ajotin çûye cot  
Xwari parî mast û mot  
Şerjekir sor, goşt sirot  
Ar berada canî hut

Tajî ser zinar mexel  
Li soq xistî çoy zoxal  
Avetî navqîrs û qal  
Gayî reş hillâ, hatî mal

Guri guriye hune kê  
Bazdayî ser stune kê  
Stun lerzî, lekiya  
Guri serra pêkiya

Guri sivîk bêbarê  
Jinê hutîk guharê  
Lo hilato zu warê  
Finc Firotî du serê

Lo huto tu suhatî  
Ew derav,a kê gotî  
Ta girtî zikda petî  
Tîrse guri dil qotî

Jinîk hilgirt hut revî  
Çîhiştî mal û zevî  
Ling dawistî serkevî  
Şun ê lêda nehewî....

Xizan revî rast û çê  
Eşin diran perçê gep  
Lingê westî rep û tep  
Guri sîngê xistî lep


Va camer,a guriye  
Welat welat gerîye  
Pîrr diye, têr dirîye  
Kûlê dinya ra nêriye.

\*-Va çiroka bi awayê lîrik hatiyê nîvisandin

# BİNBOĞALAR'DA KÜRT ŞARKILARI-3

## (KLAM Ü STRANÊN KURDÊN BİNBOĞA)

Hazırlayan: *Mehmet Bayrak*



1993 yılında Sivas'ta yakılarak katledilen Orta Anadolu Kürtlerinden ressam ve karikatürist Asaf Koçak'ın çizgileriyle "Dağlarda akıp gelen Kürt şarkıları"

**Esmer**

Ro hilatiye de de si - bê - da, Oy lê e - zî din bûm de der-dê te - da,  
Kirîv tu bû - ya ma - lê te bi - şewitîya ku te carkê derî le min dera - nî xwedê da - da,  
Wax li min le min za - li - mî le min, Wax le min le min be çâ - li - mî le min.

Nota: Zozan Ozmanian

Ro hilatiye de sibê da  
Oy lê ezî din bûm de derdê te da  
Kirîv tu bûya malê te bişewitîya  
Ku te carkê derî le min vekir

Xwedê dada

Wax le min le min, zalimê le min  
Wax le min le min, be çalimê le min  
Payîz hatiye hêndî sar e  
Zalim, ku derdê te eke ê min hezar e  
Zatan<sup>(1)</sup> xelkî be hewesa dilê xwe ra  
dekeni, delizi

Garîp çîma ustî min û te î xar e  
Wax le min lê min, ustî xarê lê min  
Wax le min le min, bêxeberê le min

Te ez din kirim be vî aqılı  
Kevirekî dedim ser vi dilî  
Xirabîya min û te je Xwedê ra ci bû  
Ku ez deşewitim tu denali  
Wax le min le min esmer le min  
Wax le min le min, bextreş le min

Çîma tuneye çara me  
Ca Xwedê bigê be cara va

Ku mérkekî le dunê miradê xwe hilnanî  
Le dunê yaşeme<sup>(2)</sup> ê heram e  
Wax le min le min, esmer le min  
Wax le min le min, min tunediya le min.

Gotin ú Muzik: **Şahsultan**  
Berhevkar: **A. Alxasî**  
[Kilama Albistan/Maraşê]

<sup>(1)</sup> Zatan: jixwe  
<sup>(2)</sup> Yaşeme: Jiyîn

## Fadîme

Nota: Zozan Ozmanian

Di-li-hê min şû-na te ye î her ro be dal-xe ye,  
Di-li-hê min sû-na te ye î her ro be dal-xe ye,  
Te-he ji mi-lan-da ki-riñ tu çî-ma ê bê sev-da ye yar Fa-dî  
me Fa-dî-me, Yar Fa-dî-me Fa-dî-me can Fadî-me Fa-dî  
me carkê we-re malê me.

Dili min şûna te ye, î her ro be dalxe (pêl) ye  
Dili min şûna te ye, î her ro be dalxe ye  
Te je milanda kirin, tu çîma ê be sevda ye  
Yar Fadîme Fadîme, can Fadîme Fadîme  
Caekê were malê me

Ezê tim le çiyakî bim, le yaylan<sup>(1)</sup> be bakî bim  
Ezê tim le çiyakî bim, le nav gulan be bakî bim  
Je xatîrî te rindê, ezê be eşqîyakî bim  
Yar Fadîme Fadîme, can Fadîme Fadîme  
Dakê te yê zâlim e, ê nizani be halî me

Le Nergele<sup>(2)</sup> baxçe ne, le Qaşdaxê<sup>(3)</sup> yayle ne  
Le Nergele baxçe ne, le Qaşdaxê yayle ne  
Keçikê ergen le yaylan, ê timê be dalxe ne  
Keçikê ergen le yaylan, ê time be sevda ne  
Yar Fadîme Fadîme, ez heyranê Fadîme  
Carkê were gundê me

Fadîme were malê me, carkêbihnke gulê me  
Fadîme were malê me, carkêbihnke gulê me  
Le vê buharê ku weri, dîsa were yaylê me  
Yar Fadîme Fadîme, yar yayleci Fadîme  
Yar bêrîci<sup>(4)</sup> Fadîme, ez heyranê Fadîme

Şahsultanî sêrsiz e<sup>(5)</sup>, tu eke wijdansiz e  
Şahsultanî<sup>(6)</sup> sêrsiz e, tu çiqase dînsiz e  
Şorê dakê xwe meke, eke<sup>(7)</sup> pire ersiz e  
Yar Fadîme Fadîme, can Fadîme Fadîme  
Tu çiqase zalim e, carkê were gundê me  
Yar Fadîme Fadîme, can Fadîme Fadîme  
Carkê were malê me, ez heyranê Fadîme

Gotin û Muzik: **Şahsultan**

Berheykar: **A. Alxasî**

[Kilama Albistan/Maraşê]

<sup>(1)</sup> **Yayle:** Zozan, Kurdên li herêma Albistan û Marcşê, li ciyê peyva „yayle“ bi kar tînin.

<sup>(2)</sup> **Nergele:** Gundekî Albistanê ye.

<sup>(3)</sup> **Qaşdax:** Navê ciyakî ku li herêmê ye.

<sup>(4)</sup> **Bêrîci:** bêrivan

<sup>(5)</sup> **Sêrsiz:** reben, bextreş, kesê ku qîmetê nadînê.

<sup>(6)</sup> **Şahsultan:** Navê dengbêj ê

<sup>(7)</sup> **Eke:** yeke.

**Zalimê**

Not: Zozan Ozmanian

Lê lê tu le çiya · kî ez li çiya · kî Za · li · mî ba lê · di-xe lê  
 her he · wa · kî, Lê lê se-wa ku min je te hezki · ri  
 Dil · ber te · ma te ez di · kuj · tim be sev · de · kî Ey ey ey ey ey  
 Lê za · li · mî ey ey ey.

Lê lê tu le çiyakî, ez le çiyakî  
 Zalimê ba lêdixe her hewakî  
 Lê lê sewa ku min je te hezdikiri  
 Kirîv tema te ez kujtim be sevdakî  
 Ey ey ey, lê zalmî ey ey ey....

Lê dostê çiyayê Qaşdaxê ekî bilind e  
 Zalimê têda têne goça gund e  
 Xelkê ku çêl û çûrne(1) xwe hene  
 Je heq da dostê minê eke rind e  
 Ey ey ey, ez qe tune bim lê lê lê ....

Lê lê êiyayê hana rê de ber ra  
 Zalimê çavres bûrî de ser ra  
 Dostê ez ê ber dunê pir degerime  
 Ez be quererê dili xwe, tu rindan nabînim de ser te ra  
 Ey ey ey, ey sebabâ min ey ey ey ....

Dostê were k,em be hev ra rût û cerm bin  
 Ku em mîna Esli-Kerem de ser hev da ar bin  
 Ey ey ey, ey lê lê sebabâ Şahsultanê ey ey ey....

Gotin û Muzik: **Şahsultan**  
 Berhevkar: **A. Alxasî**  
 [Kilama Albistan/Maraşê]

### (1) Çel û çûr: Keçel û kor

Bese dînê

Nota: Zozan Ozmanian

Be vî sevdayî min dîn meke  
Zalim hîn-dî merhemet ke  
Were were Besê dînê  
Ku min de ser te rade çê<sup>(1)</sup> mîze kir  
Tu hingê be serevde ke  
Were were Besê dînê

Be vî sevdayî min dîn meke  
Zalim hîn-dî merhemet ke  
Were were Besê dînê  
Ku min de ser te rade çê<sup>(1)</sup> mîze kir  
Tu hingê be serevde ke  
Were were Besê dînê

Besê min eke esmer e  
Bejnê xwê be zêrî zer e  
Were were besê dînê  
Wekî din ê pire rinde  
Bazi aqili xwe'y kehr e  
Were were Besê dînê

Bengkî<sup>(2)</sup> le çengê<sup>(3)</sup> te ye  
Heyfa min ê lê singê te ye  
Were were Besê dînê  
Qehran be bavkî xwe meke  
Sebeba te dakê te ye  
Were were Besê dînê

Porî te çiqas reş e  
Evdengkirinê te,y pir xweş e  
Were were Besê dînê  
Zalim ê ku em je hev kîrin  
Dexwazim şanxwîn vereş e  
Were were Besê dînê

Şahsultanî be sevda ye  
Î le riya te perwane ye  
Were were Besê dînê  
Tu be min ra erê biwê  
Min le rîyê te serî xwe da ye  
Were were besê dînê  
Were were Besê dînê Tu yara dilî minî  
Were were ez heyranê

Gotin û Muzik: **Şahsultan**  
Berhevkar: **A. Alxasî**  
[Kilama Albistan/Maraşê]

<sup>(1)</sup> Çê: kê.

<sup>(2)</sup> Beng: xal, şanikê ben

<sup>(3)</sup> Çeng: çen, çene, erçen.

**Gulicanê**

Çi kani - ye - ke le ber diyêr e  
A - vê sa - re we - ke çé - re  
We-re we - re Gu - li - ca - nê  
Mérkî ku mi radê xwe hil - na - ni  
bi dest bi - gi - rin bavê - ne êr e, Ax mi - né Gu - li - ca - nê.

Nota: Zozan Ozmanian

Çi kaniyeke le ber diyêr <sup>(1)</sup> e  
Avê sar e weke çér <sup>(2)</sup> e  
Were were Gulicanê  
Mérkî ku miradê xwe hilnanî  
Bi dest bigrin bavêne êr e  
Ax le minê Gulicanê

Le Meraşê müşmiş debûy ne  
Dendikê xwe xweş debûy ne  
Were were Gulicanê  
Ku keçik lawkê rind le ku hene  
Qedirê xwe reş debûy ne  
Ax le minê Gulicanê

Deriyê we de deriyê me da  
Ku min girt te çima veda  
Were were Gulicanê  
Sewê ku me je hev hezkiri  
Ev ci arê ku de meriyê te da  
Ax le minê Gulicanê

Dilî min î be birin <sup>(3)</sup> e  
Gulican tu êsir kirin e  
Were were Gulicanê  
Le qûli zemên nemîni

Ku be gencî dert min kirin e  
Ax le minê Gulicanê  
Baran barî le erdê neket  
Şerpa te le malê me ket  
Were were Gulicanê  
Ku dake <sup>(4)</sup> te got ku ka şerpa te  
Bê le kinc şusṭinê be ber avê ket  
Ax le minê Gulicanê

Gulican bejnê xwe de bake  
Porî xwe be serda şe ke  
Were were Gulicanê  
Bese Şahsultan şewitî  
Be vi sevday min din <sup>(5)</sup> meke  
Ax le minê Gulicanê  
Merhemet ke Gulicanê

Gotin û Muzik: **Şahsultan**  
Berhevkar: **A. Alxasî**  
[Kilama Albistan/Maraşê]

<sup>(1)</sup> **Diyêr:** gir, tûm.

<sup>(2)</sup> **Çér:** kér.

<sup>(3)</sup> **Birin:** birin

<sup>(4)</sup> **Dak:** dê, dayik.

<sup>(5)</sup> **Din:** din, (ne ol)

Nota: Zozan Ozmanian

Oy lê..... oy.....  
Dostê çel qirix <sup>(1)</sup> è je hev hezdekin  
Ê terin tim qalê hev dekin  
Were yar.....  
Lê lê ez heyranê adetêhêlê me ne  
Ê dilê sadiq jehev dekin  
Were yar.....  
Ax le min yerê, le min yerê  
Geribê yerê..... oy.....

Oy lê..... oy.....  
Dostê her ku ez serî xwe datînim  
Ezî te be xewn debînim  
Were yar.....  
Dostê lê rind vê dunê pirin  
Ezî degerim tuye minê te nabînim  
Were yar.....  
Ax le min yarê, le min yarê  
Mehkumê yarê..... oy.....

Oy lê..... oy.....  
Dostê avê Nergelê le ser dilan şeqand  
Çaxa ku ez dehatim, te çima de dû min da  
deda hesretan  
Were yar.....  
Lê lê mala talya <sup>(2)</sup> xirab bişewitîmin  
Ku gurbeti je me ra kiriye Wetan

Ax le min yerê, le min yerê  
Mehkumê yerê..... oy.....  
Oy lê.....oy.....  
Dostê ew ci qewaxe <sup>(3)</sup> ku deverd keti  
Ba lêdixe qol <sup>(4)</sup> deqeti  
Were yer.....  
Ez heyranê tu xêrxwaze min û te tune ne  
Were k,em destî xwe de destî hevkin  
Herin je vê memleketê  
Were de yar, were de yar.....  
Ax le min yarê, le min yarê  
Mehkumê yarê..... oy.....

Oy lê.....oy.....  
Dostê were k,emherin yali baxan  
K,em rûnin le siyê qewaxan  
Lê lê wijdansizê merhemet ke  
Te Şahsultan kujt be meraxan  
Ax le min yarê, le min yerê  
Mehkumê yarê..... oy.....

**Cotin û Muzik: Şahsultan**  
**Berhevkar: A. Alxası**  
[Kilama Albistan/Maraşê]

<sup>(1)</sup> **Qirix:** Kesên ku bi dizî ji hev hezdikin, ku evîna qedexe bi hev ra dijîn.

<sup>(2)</sup> **Talî:** hext, şans, felek

<sup>(3)</sup> **Qewax:** sipindar

<sup>(4)</sup> **Qol:** şax

Dostê 1

Nota: Zozan Ozmanian

Dos - té çiya - yé Qaş - da - xé lê ber be dar e,  
 Dos - té çiyaye Qaşda - xé (xey) lê ber be da - re,  
 Bü - kê a - vê yay - lê me ye sa - re le we - re  
 ia ia az hevra - na

Dostê çiyayê Qaşdaxê lê, ber be dar e  
 Dostê çiyayê Qaşdaxê lê ber be dar e  
 Bükê avê yaylê me yê sar e, de were lê lê ez heyranê  
 Ax ê le avê hesret e  
 Qurban ê le dili min dekiye ker<sup>(1)</sup> e, de were lê lê lê te nemayê  
 Le Qaşdaxê sosin debûy ne, dostê le Qaşdaxê sosin debûy ne  
 Wextê yaylan hêşin debûy ne, de were lê lê yatileci yarê  
 Ê ku je giştan baqiltir  
 Weleh sewê doston din debûy ne, de were lê lê tu ne dostî  
 Dî<sup>(2)</sup> Nergelê baxçe ú bax e, dî Nergelê baxçe ú bax e  
 Dostê dilî min je te ra durax e, de were lê lê bejn ziravê  
 Ku du dilan je hev hezkir  
 Ez qurbanê le nezerê heq<sup>(3)</sup> nê yasax e, de were lê lê mehkumê yarê  
 Le Ambarê<sup>(4)</sup> gul dubûy ne, dostê le Ambarê gul debûy ne  
 Keçikê rind vê dil debûy ne, de ax le minê vê dilê yarê  
 Ê ku je hev hezdekirin  
 Weleh le hêlê me rezil debûy ne, de were, lê lê rezilê yerê  
 Seqaldutanê<sup>(5)</sup> le amec e, dostê Seqaldutanê le amac e  
 Bûke rêtê ber ê be wîrwe e, de were lê lê de rê da were  
 Ez bû me Şahsultan şewitîm, dostê ez bû me Şahsultan şewitîm  
 Weleh eşqê te je min ra derman e  
 Dostê eşqê te je min ra îlac e, were lê lê melhema minê

Gotin û Muzik: **Şahsultan**  
 Berhevkar: **A. Aixası**  
 [Kilama Albistan/Maraşê]

<sup>(1)</sup> **Ker:** Ev bi maneya qelişandinê ye. Ava sar dilê wî kerî kerî kiriye, qelaştiye

<sup>(2)</sup> **Dî, di:** gund

<sup>(3)</sup> **Heq:** Xweda. Li yê herêmê piranî peyva „heq“ bi maneya Xwedê tê bi kar anîn.

<sup>(4)</sup> **Ambar:** Gundeki Albistanê (Elbistan) ye

<sup>(5)</sup> **Seqaldutan:** Gundeki Bazarcîxê (Pazarcık) ye.

## Dostê 2

Nota: Zozan Ozmanian

Dos-tê ba - kî da - ran lê di - he - jî - nî, A - vê cur - ran  
lê de - çel - qî - nî Dos-tê min ev je te lê re - cû ne - kir ku tu be vê se  
ve - day min bi - pe - qî - nî, We - re we - re lê bejn zi - ra - vê,  
Qirxinî - yê di - lê lê xwe ba - vê.

Dostê bakî daran dehejini  
Avê curnan<sup>(1)</sup> deçelqîni  
Dostê min ev je te recû<sup>(2)</sup> nekir  
Ku tu be sevday min bipeqîni  
Were were bejn ziravê  
Qirxinîyê dili xwe bavê

Dostê mektubekê yolemiş ke<sup>(3)</sup>  
Navî xwe le ser yazmiş ke<sup>(4)</sup>  
K,ez bêm dostê, tu bê heval  
Dijminê me çetlemiş ke<sup>(5)</sup>  
Were were bejn ziravê  
Su<sup>(6)</sup> ketina dili xwe bavê

Dostê tu be çam be lê, ke be merx bim  
Tu be mî be lê, ke be berx bim  
Ez qurbanê, heta ku em je hev têr bûn e  
Tu be gul be lê, ke be av bim  
Were were bejn ziravê  
Qirxinîyê<sup>(7)</sup> dili xwe bavê

Dostê tema tu de dalxa min bû  
Tu delala dili min bû  
Dostê poşmaniya paşê pera nake  
Lê lê, berê aqilê tey le ku bû  
Were were bejn ziravê  
Le su ketina dili xwe bavê

Here dostê lê te ez kujum  
Te ez destpê kirim le dunyê hîstîm  
Şahsultan bû ye berfa çiyayê qaşdaxê  
Tê ez helandim tu ne hîstûm  
Here dostê le te nemîni  
Tu mirazî xwe hilnanî  
Were were bejn ziravê  
Tu qirxinîyê dili xwe bavê

Gotin û Muzik: **Şahsultan**  
Berhevkar: **A. Alxasi**  
[Kilama Albistan/Maraşê]

<sup>(1)</sup> **Cura:** Kortên kûr, ku di zinar û latan da bi avê baranê tije dibin.

<sup>(2)</sup> **Recû:** Hêvi, ercû nekir; hêvi nekir, ne dipa

<sup>(3)</sup> **Yolmîş ke:** Bi rêke.

<sup>(4)</sup> **Yazmîş ke:** binivise

<sup>(5)</sup> **Çetlemîş ke:** biderizine. Derizandin, qehirandin.

<sup>(6)</sup> **Su ketin:** xeyidin

<sup>(7)</sup> **Qirxinî:** dilşikeşti, xeyidin.

Nota: Zozan Ozmanian

**Dostê 3**

www.kursivakurd.org

**Were-were yarê yarê  
Garibana ustî xarê**

Dostê te dî ku le me çir kirin  
Ustiyê min û te xar kirin  
Tu dostên min û te tune ne  
Were k'em sewê hev bimirin  
Were were yarê yarê  
Garîbana ustî xarê

Tu çiqas eke xayîn e  
Were carkê min bibîne  
Ku tu dosteke sadiqane  
Be vî sevday min meşewtine  
Were were yarê yarê  
Garîbana ustî xarê

Dakê te yê melamet e  
Bihna te je rahanê me tê  
Ez sewa te şewitîm yarê  
Hêdi<sup>1</sup> were mehemet ke  
Were were yarê yarê  
Garîbana ustî xarê

Tu çî haye din û zirt e  
Were ke Şahsultan bipirse  
Te ez mîna Kerem şewitandin  
Zalim je xwedêyî xwe birise  
Were were yarê yarê  
Garîbana ustî xarê

Gotin û Muzik: **Şahsultan**  
Berhevkar: **A. Alxasî**  
[Kilama Albistan/Maraşê]

<sup>1</sup> **Hêndî:** edi

Nota: Zozan Ozmanian

**Dostê 4**

Dostê çûme serî çiyayê Qaşdaxê oy...  
 Lê lê min mîzi kir le yali Binboxê<sup>1</sup>  
 Dostê ku dilî te jî mîna dilî min e oy...  
 Lê lê were Turkiye be ûçaxê<sup>2</sup> oy...

Dostê çûme serî Çalanqelê<sup>3</sup> oy....  
 Lê lê min mîzi kir le yali Nergelê  
 Min go dostê were em ê hevdune oy...  
 Lê lê min çare nedî le te tembelê oy...

Dostê ez deketime orta diyêkî (gundekî) oy...  
 Lê lê min tu pirsî je almancîyekî oy...  
 Dostê sewa te le nav êlan megergism  
 Qurban ezi bûme serserîyekî oy...

Min go lê lê esmer were va ya te nebû oy...  
 Lê lê heyfa minê le rîndiya te bû mekin  
 Tema4 ev sevday berê î le serî we bû oy...

Gotin û Muzik: **Şahdultan**  
 Berhevkar: **A. Alxasî**  
 [Kilama Albistan/Maraşê]

<sup>1</sup> **Binboxe:** Çiyayê Biboxe.

<sup>2</sup> **Ûçax:** firok, balafir.

<sup>3</sup> **Çalanqele:** Dibe ku navê keleyek be li herêmê. Ez bi xwe li ser vi navî tu tişî nizanim.

<sup>4</sup> **Tema:** Li hemberê vê peyvê ez tu peyvê din di Kurdî da nizanim.

Wekî bêje: Çawa hun nizanîn û nayê bira we, ev sevda berê li we jî hebû, hun jî di halê min da jiyîn, hun jî nasdikin vê rewşê.

## Dostê 5

Dostê tu çîma je min radebiri  
 Derekî çaresiz te bigiri  
 Were were Pêrişanê  
 Dostê heval minê te nabin  
 Mêrkî dost ê le riyê hev bimiri  
 Were were sextekarê  
 Were were berdiwarê  
 Dostê here le te nemîni  
 Tu miradê xwe henîni  
 Dostê te ez şewitandim  
 Te ez de keviran firandim  
 Sûçê min je te ra ci bû  
 Te ez de dora xwe gerandim  
 Dostê here le te nemîni  
 Şan<sup>1</sup> tu belê xwe bibîni  
 Here here pêrişanê  
 Dostê şorê ku de ulîyan<sup>2</sup> da maye  
 Kesî gorî dilî xwe nabîni  
 Were were pêrişanê  
 Were were dert giranê  
 Were were mal neketê  
 Ar be gundi bavê ketê  
 Dilî har i min depeqîni  
 Were were pêrişanê  
 Dostê te emrê minê teva kirîye  
 Tu miradê xwe hilnîni  
 Dostê here le te nemîni  
 Şan tu belê xwe bibîni  
 Were were ustî xarê  
 Here hêstir kirne xarê  
 Şahsultan i be tenêye  
 Tu çîma carkê virva néye  
 Were were pêrişanê

Dostê ne royê min ro ye  
 Ne Şevê min sev e  
 Giştik seba te bela ye  
 Were were pêrişanê  
 Were were dert giranê  
 Kirîvê here tu kîrvayê<sup>3</sup>  
 Here here le te nemayê  
 Here here pêrişanê  
 Here here dert giranê

## Parek ji kilamekê<sup>(\*)</sup>

Dostê te Şahsultan pir rezil kir  
 Te be eşqê xwe êsîr kir  
 Lê tu çiqase nanûxwêzî<sup>1</sup> bû ye  
 Ku te hevaliya me zû je bîr kir  
 Heywax bûkê le rîndya te  
 Dilê min keta hejna te  
 Ez şewitûm yar sewa te oooy...

(\*) Ev dawîya kilamekê ye. Ji bo ku kasêt  
 bizdibû pêşîya vê kilamê em nizanîn ku ci ye.  
<sup>1</sup> Nanûxwêzî: bênanûxwê, nankor, xayîn.

Gotin û Muzîk: **Şahdultan**  
 Berhevkar: **A. Alxasî**  
 [Kilama Albistan/Maraşê]

<sup>1</sup> **Şan:** inşalah. Gava nifiran dikin bi kar tûminç  
 Wekî: şan tu sibê nebîni, şan tu işev bimiri.

<sup>2</sup> **Uli:** Merivên pîroz û mezîn.

<sup>3</sup> **Kirva:** kirîv.

# Çîrok

## Keçîka Axê

Berhevkar: *Muzaffer Özgür*

Ci hebî yê ci tune bûye zemankî axayek hebûye. Wî axayî 800 pezî xwe yî bi 40 şivanî hebûye. Karê van pir bûyê. Li aliye din da ji, keçikika axa yê pir rind û delal hebûye. Rokê axa ji jinika xwe ra dibê:

- Em herin bajêr, ser-kincêن xwe bikin, pirtûnî bîstinin.



Ji bo tû nerindî nêñ ser keçîka xwe, wê dike konikî ú dor aliyê kon da bîra dikole. Ji wî karî şîva, jîna xwe heydinê tere bajêr.

Seet terin, ro terin. Rokê eşkiyak ji çiya tê deşte û konê axê dûyne. Tê hêla kon û denga dibîze. Şivan bi keçîka axê ra dibê:

- Dilê minî li te ye, tê min bikî? Keçik jî bersiva wî didê:

- Bayê min ez teslimê tê kirim. Ez te nakim (rûdine û digirî).

Eşkiya derdikeve meydanê şivên dikujê. Bî keçikê ra dibê:

- Tû xanga minî, were, em derkevinî derva. Gavêñ xwe davêñ û herdû ji dikevin bîrikê.

Zemankî şinda axe û jîna xwe têñ  
mala xwe.

Mêşdikin keçika wan tuneye. Axe ji  
jîna xwe ra dibê:

- Va wara li me nehat! Goça xwe  
topdikin, bardikin derika din.

*Eşkiya di bîrê da dibê:  
Havayî barê şekê tekê  
Bruska barê çiya bi şewkê  
Henîya xuşka (xang) min ê bi deqê*

Wext tere, zeman tere, ji bîre xelas  
dibin. Hendik terin, pîrr terin, rîya wan  
bi mala bavî keçikê dikeve. Axe wan  
nîvan dike. Ji keçikê pîrr hezdike. Ji  
eşkiya ra dibê:

- Xuşka te pîr rînd e, dilê min ketê, tê  
bi min di. Eşkiya dibê:

- Tu axaye kî, ezê bi qurbanê tekim.  
Axa bi keçikê ra dixwaze dengke û dibê:

- Ji min ra qala xwe bike.

Keçik meseleyên ku ji serî derbas  
bûne, jê ra dibê. Axe pîs dike.

- Oy mala min, xalî li serê min be. Tû  
keçika minî, dibê û kilamê distêre:

*Yerî yerî axê yerî  
Pezê axê diçêre bêrî bêrî  
Kê ecebê wenge giran dîne  
Bav li keçika xwe buyê müşterî*



Axe bang eşkiya dike û je ra hekata  
xwe dibê.

- Keçika min helalê te ye.

Wana li hew mar dike. Je ra heft ro,  
heft şewa li dolê dixe.

Çeroka min cu qatê, rehmet li wê  
cimatê.

#### **Değerli okuyucular, abone üretimiz değişmiştir.**

Xwendevanen birêz, heqê abonetîya kovarê hatîye guhartîn.

**1 yıllık (ji bo salekê):** İsvêç: 280 SEK • Almanya: 40 DM

**Türkiye banka hesap numarası:** F. Yıldız Vakıf Bank Polatlı Şubesi  
Hesap No: 00158001 445398272.

**İsvêç hesap numarası:** (Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

**Almanya hesap numarası:**

M. Özgür, Stichwort "Bîrnebûn" Deutsche Bank-Köln  
Konto Nr: 591 26 62 BLZ: 370 700 60

İsim ve adresinizi yazmayı unutmayın! Nivîsandina nav û navnîşana xwe jîbir nekin!

# LAWÊ HESPÊ

*M. Sirin Dağ*

Çi hebu yê ci tunebu yê. Li gundeki mîr û jinek hebûyê. Tu kurikê wan nebune. Toxtor bi toxter digerîne û li ber xwedê digerîne ma kurekî bide wana. Piştî sala bûn xwedî yê kurekî.

Rokê jin di xevna xwe da kalekî rispî dibîne.

Kal jê re dibê:

– Sibê here kêleka behrê, hespekê ji nav behrê stûyê xwe biderxe. Di devê wî de sêvek heyê. Sêvê jê bixwaze û bi mîre xwe re parke. Her yêk ji nîvî sêvê bixwin. Daviyê de xwedê dê lavekekî termi zérinî bide we:

– Sibê jin radibe û xevna xwe ji mîrê xwe ra kat dike û bi mîrê xwe ve tev diherin behrê. Wek kalê goşî, ji nav behrê hespek stûyê xwe derdixe û di devê wî da sêvek hebû.

Hesp:

– Ezê sêvê bidim we. Hunê bibin xwedî yê lavêkekî termi zérinî. Lê lavik heft salî bu, hunê ji min ra bînin. Jin û mîr ji bêcarî xwastina hespê qebul dikan. Sêva xwe par dikan û dixwin. Ro diherin û ten. Lavekî wana tê dinê. Lavik mezin dibê heft salên xwe tiji dike. Lê

naxwazin lavê xwe bidin hespê. Bevê xwe dibê:

– Em jê re heqivekê dagirin. Ma here ci yêkî ji behrê dur û xelas be. Wer ji dikan. Lawik heqîwa xwe digre, serê xwe heydene û dihere. Pir tere, hendik tere, mîze dike kû li ser reya wî laşek heye. Li ser lêş; şerek, gûrek, teyrek û mîriyek heye û ji bo parva kirina lêş her çar bi hev ra şer dikan.

Lawik dibê: – Hun dawestin, ez li we parvakim. hestîyê sîngê para şer, pil û hêfer para gûr, tiştê hûndir bila teyr bixwe. Serê lêşe ji besê mîriye ye

Her çar hêyvan bi wê parkirinê têne ser û ji lêvik re dibêjin: – Te ew rindi ya ji mere kir. Due yên me hene. Em wan duena bi ber texin. Dema kû ser û belan hatin serê te, tu wan duena bixwine em dê werin, te xilaskin. Dueyên xwe bi ber têxin. Lawik xatirê xwe dixwaze û bi rê dikeve.

Pir tere, hindik tere raste gundekî tê. Mala axayê gund dipirse, dihere mala axe, li wir dibe mîvan. Ji axe re dibê:

– Ez li karekî digerim

## Axe

– Naxirê me bê gavan e, tu bişadikî here naxirê.

Lawik qabul dike û li wî gundi naxira êxe diçérîne. Li wî gundi ser deh salan re gavanî yê dike.

Keçeke êxe yê pir rind hebuyê, bi lêvik ve dilê xwe dikevin hevdu. Bi şev, bi dizî hevûdu dibînin. Va cend ro û mehan berdevam dike. Rokê ji meriyên êxe, yek ji êxe ra durima van kat dikê. Axe bane lêvik dike, je re dibê: – Te li kê derê dîyê ku gavan bi keca êxe re zewicine.

## Lawik:

– Em ji hevûdu hezdikin, me dil girtîyê.

## Keca êxe ji dibê:

– Erê bawo rast e, em hevûdu hezdikin, me bizevicine.

Axe naxwaze dilê keça xwe bişkene. Lê, bi xwe xwe dibê; ezê bi al wî bikujim. Ji lêvik re dibê: – Du şertên min hene. Te ew anîn şunê, ezê keça xwe bidim te. Lawik qebul dike.

## Axa:

– Şerta min ê siftê; xaniyêkî min tiji ce heyê. Lê ce û genim tevûhev bune. Tu yê di şevekê de cê û gênim ji hev bibjerî. Lewik tere xaniyê cê û gênim, dest bi bijartinê dike. Lê mêzedike pir bi qare. Wê demê hêyanen ser lêşe têne bîrê. Due ya mîriyê dixwîne. Li ser dinê çiqas mîri hene giştik digên hev û di şevekê de jê re cê û gênim ji hev

vedibjêrin. Axe sibê mêzedike ku ce û genim hatîyê bijartinê. Heyret dike û jê re dibê:

– Şarta min a din; paş heft çîya gundek heye. Xwanga min li wir dijî. Qet kes neçûye wira. Pir dûr e. Tu yê herî qelûna min li wir e, tu yê ji min re bînî.

Lawik dikeve rê pir tere, hindik tere diweste. Li bin derekê rûdine û difikire. Wê demê teyra li ser lêşe têbîrê. Dua ya teyrê dixwînê. Li ser dinê çiqas teyr hene berhev dibin têlêwik dikin perê xwe terin mala xwanga êxe. Qelûna êxe hildînin, tînîn ji êxe re. Axe dibê:

– Te heq kir ezê keça xwe bidim te.

Axa çel ro û çel şevan jê re li dolê têxe. Lavik dibê ezê bûkê bibim mala bavê xwe. Axa destûra wan dide. Bi rîdikevin, ku here gunde xwe, gavak têl kâlaka behrê, hespek ji nava bahrê stûyê xwe derdixe û dibê:

– We ji bîrkir, lê min ji bîrnekir. Dê û bawê te li ser şora xwe dane-westiyan. Ez iro te nadim wana. Lawik rûdine, dueyên şer, gûr û teyran dixwîne. Li ser dinê ci şer, gûr û teyr hene giştik têl li hespê dicivin. Hesp dikujin û wana xilas dikin. Wana dibin mala bavê wî. Li gundê xwe ji çel ro û çel şevan li dolê dixin. Bi dê û bavênen xwe ve digên ber miradê xwe.

Çiroka min çu qatê, rehmet li vê civatê.

# KLAMÊN ALÎYÊ ME

Berhevkar: *M. Şirin Dağ*

## BARTI

Baran barî herd miş miş  
Cani yê tor bu ling terîş  
Xelkê go çî berdûş e  
Min go lawikî xort bu di xwe gerisî

Bertî Bertî aman Bertî  
Koma malê Kûmê li min rabirtî  
Sala yek bu min dilekî xwe girtî  
Qûta pîrik ji dest min girtî  
(Neqaret)

Jêrda tê wo te xwe bakir  
Dûmanê cixalê li xwe belakir  
Xelkê go çî berdûş e  
Min si û sê cara maşella kir  
Lo cûtgaro cût li bennê  
Onderê di dest da ji dari  
Em barkinî herinî yaylê  
Arî kişê yî li me nê

(Gundi Omê)

## EF

Şev e şev e Efo şev e  
Ma bayî berbangê li te nekeve  
Ar di mala hekim keve  
Go efê bi çuk e li te nakeve  
Ezo bi teva ezo bi teva  
Kanî ya gundê me mermere  
Ef çî ya rind e tere sere  
Bejna Efê dara ter e  
Wirda wêda werdigere

Gölyazı

## XELO

Lawo lawo Xelo lawo  
Dîwar bi ser de xaliya wo  
Ela Musê ji bin reviya wo  
Xelê min di binde ma wo  
Neqaret(rewan)

Ewrekî reş î tarî  
Ne girmişî ne ji barî  
Xelî min tu derde xwe tunevun  
Xelê min kuştin ji necarî

Li bana xelo li bana  
Kerî yê Şukirê neman hatin dana  
Kerî yê Xel î min di fêzeda mana  
Dakê xwe qurban xuna  
meyî li dev û dirana

AGIT (Zincirlikuyu)

## AMAN LO

Hiv helatiyê çî ya bilind e  
Sewqa xwe da bejna rind e  
Her ku çavê min li bejna te ket  
Ezî dînik bu me li nava gund e

Aman Elo aman Elo  
Bejna zirav dîragê kela  
Porê pirî li te bu bela  
Xwedê emreki pir bi min te da  
Min bikişanda tela bi tela  
(neqarat)  
Ezo bi teva ezo bi teva  
Nifira bikinî dê û bava  
Destê xwe di destê min ke  
Ma kûr biwin ji her du çava

Cindi cindi Elo cindi  
Av li porê zer cemidi  
Elo gidi Elo gidi  
Av li porê zer cemidi

Gölyazı

## BIRÎNA KEVN

Birîndar im  
Devê birîna min sar e  
Va birîna  
Birînek kevnare  
Çend Newroz rabirtin  
Kevê nagre  
Newroz disa dixemile  
Ji nûva were  
Dilê min de ragerîne  
Min berve çiya dikişine  
Carek din  
Germîye Newrozê  
Bide ser devê birîna min  
Bikewîne  
Ax li min  
Birîndar im  
Dayê li min  
Li cemê Diiclê biqelivîne  
Birîna min  
Sor biherike Diiclê  
Carek din  
Ma avde  
Neçilmisen  
Kulilkên azadî ya min

1995 *Mem Xelikan*

# ŞERÊ PISMAMA

*M. Sirin Dağ*

Payiza 1919a, ber êvarê, ewra reş dagirtibû ser Awanoxlîyê. Husê Birê xortekî bihîst salî ye. Bi Elê va dil girlibûn. Qewlê xwe dane hev û du ku birevin. Şevê reş bû, hîv jî tunewû, çava çav nedidîn. Baranê jî dest pê kiriwû. Husê hespê xwe zing zingî kir, sileha xwe li nava xwe girê da û siwar bû. Çû herda ku bi Elê va şor dayiwûn hev û du. Elê di bin wê baranê da li benda wî bû. El avite terkîya xwe jî nav gund bi derket, berê xwe da Qonyê. Li wir merine xwe hewûn. Du şev û du roya da gehîştibû Gundê Pêxas. Li mala Hecîyê Osê bû mîvan. Yê jî berekê wûn. Bapîrê wana ji Deşta Kort (Çûqirowê) tev û hev hatibûn Anadoliya Navîn. Hen ji wana li Qişêrê bi cî û war bûyîwûn. Ji wê berê hen hatibûn li Qonyê cî girtibûn. Husê hatiwû xwe avitibû paş meriyên xwe yê li Gundê Pêxas.

Dû nîvro wû. Husê Birê û Hesenê Mihê li ser sokana Mala Mihê rûniştibûn. Hesen qehwek bi kelandî dayibû jî Husê ra. Cixare dikişandin. Hesen jî hemşalê Husê wû. Nozde-bihîst salî wû.

Husê jî Hesen ra digot: "Bavê min tim qala meriyê me yên li vir dike. Li vir pir meriyên me hewûne. Lê ez wana rind nas nakime. Hecîyê brangê te salê carekê tê li mala me dibe mîvan. Ez wî rind nas dikim."

Hesen "Erê dizanim. Tim dixwaze here axza we, cem meriyên xwe. Nuha

dîsa wê va çû. Mehîneka me ya qir hewû. Çend ro ne wenda bû. Em lê gerînî negerînî me nedî. Mehîn kire mane, wî me ra jî go" Ezê li mehînê bigerim. Min ew di dî, min nedî, ezê heta Qişêrê herim. Tu here ku nuha li mala we ye" got.

Husê: Bavê min ji bo Hecî digot; eşqiyakî mezin e. Li wan derana bi nav û deng e. Heqqê kesî naxwe. Xizana rind diparêze.

Hesen "Li van derana tê girtinê. Cîran û heval jê hez dikin. Hevalê Hecîyê Buxurcî ye. Cîrana diparêze. Ji dest yên bi heyî digre dide xizana. Hecîyê Buxurcî jî, Hecîyê me jî tu cara li gundê me yên kurmanca nerindî nekirine." Got.

Hesen tewaxa xwe ya tûtinê jî ser balîfê heyna dirêje Husê kir. Husê go: "Na, ez nakişînim. Royê li ber ava ye, ez dê rawim."

Di vî devî da rêvîyek hate ber malê. Li gundê Memo, merine Mala Mihê hebûn. Lawikê xwe dizewicandin. Mala Mihê dawet dikirin. Hesen mîvanê xwe bire hundir. Li qucikê hodê yî jûr bi rûniştandî da. Li dil û xatîrê wî pîrsî.

Hesen go: "Rind e, heqqê me yê em herin. Lê Hecî li mal tune, kî me yî herê?"

Daka Hesen, Fata Mestê li dawîya hodê rûniştîwû.

Go: "Erê Hecî tune. Lê di ser gunda ra meri şandine pê me. Neçûyin nawe.

Em nerinî, ji bîr nakin. Tu yê herî. Tu yî hîn ji vê mezintir biwî?"

Hesen "Ez cara li tiştekî veng nehatime dîyinê. Ezê bi şâ bikim?" got.

Fatê "Çi heyê ku tu şâ neki? Oxintiya van biwe bide wan, dolê xêr ke, bê li qusûra me ji mêz mekin. Hecî li mal tunewû. Fatê ez şandim. Bûk biderxistin şu va lêxe were."

Hesen wê şevê mîvanê xwe berneda. Nanê wî kir, kire xewê, siwe da bi rê kir.

Daka Hesen ew kiriwû bin barekî giran. Di ser gund ra, herê gundekî yad dawetê. Hînî xort bû. Erf û edetên kurmanca dizanîn. Lê cara li tişte veng bi tenê nehatibû dîyinê. Rabûn û rûniştina xwe dizani. Ji xwe xwaş wû. Xortekî qefes qolinc pan, bejn zirav û dirêj wû. Xortekî himî çeleng, himî camêr bû. Çoyê kesî di ser çoyê xwe ra nedidî Li gund li Xeca Kalê bi dergîsti wû. Xec ji ji rîndiya xwe va pire rind bû. Meriya xwe wû. Keçkeke gewre kal, sû dirêje pî dirêj wû. Li hev û du bi dil wûn.

Ji nîvro bi şû va wû. Hewake xwaş, eyamekî payizê yî germ wû. Cûtgara toxim dirişandin. Hesen û du hevalen wî gêştibûn dawîya Gundê Memo. Dengê dol û zurnê giran giran dihate guhê wana. Ku ketin nav gund, mala Ûsê pirs kirin. Xortekî mala Ûsê ji wana ra nîşan da. Kû gêşün ber malê, kalekî 50-55 salı rawû bergunde wana hat.

Gewende zanibûn ew mîvan in, hatin li ber wana dengê dol û zurnê bilind kirin û lêxistin. Hesen ji berîya xwe zêrek biderxist û avite ser dolê. Du pez ji ji oxintiyê ra anîwûn. Kalê destê xwe dirêje Hesen kir û got "Hun bi xêr hatin"

Hesen destê kalê paçkir û da henîya xwe bi şu va got: "Ez Hesenê Mihê me,

wana ji hevalê min in." Wek Hesen di serê xwe da fikirî bû, ew xwedanê dawetê Ûs wû.

Mala Ûsê du goz xanîyê ku derf xwe li rohilat mêzedikirin, ji xwelfyê bûn, ewana xanîyê rûniştin û raketinê wûn. Bi ser wan herdu gozana va, du gozê din hewûn, derîyê wana li başûr mêz dikirin. Yêk ji wana xanîyê malê wû, tişte xwarin û vexwarinê yî têda wû. Goza din ji aşxane wû. Li rohilata xanîyê rûniştinê, ji wana firk axir, gom, kadın hewûn. Ji der va li ber quncikê ku xanîyê malê bi xanîyê rûniştinê va digêştine hevdu, xaliyekî bidestkirî raxistibûn. Li quncik postekî bizina avitibûn ser xêlî. Herdu kenarê xêlî yên digêştin diwara, balîfê yanînî yên ku bidestkirî dayî bûn her balîfa. Ser xêlî ji metîlin avitibûn. Ûsê, Hesen û hevalen wî li ser xêlî bi rûniştandî dan. Li ber diwarên din ji, çend cil û donek raxistibûn. Gundî li ser wana rûniştîwûn. Di navbera gom, axir û xanîya da meydanekî fere hewû. Jin û mîra tev û hev govend dikişandin.

Ûs bi wan rûyên xwe yên spî, mîna xortekî li dîndara mîvana dawestîya bû. Tûtin lê digirt, qehwe bi belavkirin dida. Hesen wana tûtin negirtin, ji bo ku li cem mezina venedixwarin. Ku qehwe gerandin, mezina ew girt bi şû va, Hesen wana heyna. Ûs yek bi yek li dil û xatirê wana pirsî. Merîyen xwe yên li gundê Pêxas ji mal û can da pirs kirin.

Dolê şen wû. Keç û xorten berzewac xwe xemilandiwûn. Bi sê çar qora govend dikişandin. Hesen him vi civatê ra deng dikir him govend sér dikir. Keçikê di govendê da yek ji yekê rîndtir wûn. Lê keçikek hebû, te qêmîş nedikir ku lê mîzekî. Hesen çavê xwe ji ser wê

nedibirin. Yêke bejnziray, navtenik, sûdirêje pî dirêj wû. Guliyê xwe hûr hûnayû wûn. Wexta ku xwe di govendê da ba dikir, rextê guliyâ li navê diketin. Kum dayûwû serê xwe. Di bin kum da kitânê li sêri wû. Dora kum bi zêre mendo xemilandî bû. Xestan li xwe kiriwûn. Meydanîyekî dirêj, bi ser wî da çuxekî lê wû. Bi ser çûx da saltekî Semûlê li xwe kiri wû. Bervanka herîrî dawû ber xwe, pişta Tereblûsê li nava xwe pêçayî bû. Di niga da jî lapçîn hebûn. Xezala kurda ya digotin ew bû.

Xortek hat, Hesen û hevalên wî dawete govendê kirin. Sê gavî dihate kişandinê. Sê-çar deqqa govend gerya bi şû va, Hesen tismaleke gewr jî beriya xwe bi derxist, derbase serê govendê bû. Vi gewende ra go: "Li giraniyê, li zaravê Eli Fatmê xe". Ji heqê govendê dihate derê. Sergovendekî baş wû. Di govendê da jî çavê xwe li wê keçikê digerandin. Fatê jî ku fersend dî, tim li Hesen mîzdikir.

Hesen ew ji xordekî malê pirs kir ka ew kî ye. Fata Gulê wû. Xwanga sê bira wû. Dûre dûr va merî ya xwe wû. Bapîrê wana berpismamê hevûdu wûn. Hesen ci kir ci nekir navbera xwe û Fatê dî. Pir xorta li gund ew xwastibûn. Vî kesî ra negotibû erê. Fatê jî ku Hesen dî, nedî dilê xwe ketiwû vî.

Hesen zanî ku Fatê jî wî hezkir xwast ku wê birevîne. Fatê nedixwast ku bireve. Li gora erf û edetan rev ne tiştekî rind wû. Li gora gotinêن Fatê, birayên xwe yên şer wûn, ê bela biderxîmin. Wê jî dixwast ku bi şan û bi şüret bi bûk we. Hesen wîngê jê ra rastîya xwe kat kir ku yî bi derxistiyê Fatê, êdi zanibû ku jî revê bîtir çare tune. Goti wû erê. Tismalek xwe bi hev û du guherîn. Hesen cû cem hevala nav dolê.

Siweda berbû hatin ber mala bûkê. Xalê zave sileha xwe xelat da û deri bi vekirin da. Bûk anîn li hespekî xemilandî siwar kirin. Zurne van jî li zaravê bûkê dixist. Bûk di dor gund ra çerx kirin. Anîn ber mala zêve. Jinekê perene hûr, nuk û mûjin di ser bûkê ra velokirin. Kurika dest bi hev ra dinan ew berhev dikirin. Jinekê jî dergûşek lavik anî da dest bûkê. Keçik û bûk ketin pîyên wê heynan birin hundir. Lavikekî 10-12 salî jî cizê bûkê, balifek revand bir da zêve, xelatek xwe jê stend. Ku bûk derxistin bi şû va nanê dawetê dinan. Pênc pez serjêkiribûn. Li nanê; şorba meyîrê, goş, zad û xoşava çîra hewû. Hesen vana dû nanê wa xatirê xwe xwastin. Üsê jî ew hersê ûd kirin û bi rê kirin.

Hesen dû dolê va sê şeva cû Gundê Memo û hat. Fersend nedî ku Fatê birevîne. Şeva çara brayên Fatê li mal tunewûn. Fatê vî daka xwe ra got "Ezê herime cîranekê, eza zû werim." Niv seet cû, Fat nehat. Seetek cû Fat nehat. Daka wê jî dola Mala Üsê bi şû va li wê çûyibû sêsintiyê. Fat dû dolê va hatibû guherîne. Rawû cû cîrana xwe pirs kir. Lê Fat neçûyibû wira. A ku jê ditirsa hatîwû sêrê. Cîrana xwe ya ku li navbera Hesen û fatê diçû dihatî û ew vî Hesen ra verê kirî jî got: "Xaltiya Gulê ma ew vî Hesen ra neçûyîwe?" Xaltiya Gul desten xwe avite porê xwe û porê xwe rûçikand. Hewlî bi ser gunda daxist. Brayên Fatê, ap û xalên wê û malmezînêن wana li mala Gulê berhev bûn.

Brayê Fatê yî mezin Hesê Gulê digot "rabin, em di dûkevin, vaya bênamûsî ye bêarî ye." Kesî guh nedida ser kesî. Her yekî şoreke xwe dikir.

Hesê: "Gul mayê serê me di nav xelkê da berjêr ke" digot.

Malmezinekî "em bi mala Mihê va berpismamê hev û du nî. Ew du cahil in. Wê sûşikestiyê wa anî serê me. Lê niha em dûkevin meriyê werin kuştinê, xwînê birije, gundê di hev kevin" got.

Hesê Gulê ji digot " Ez bi ser vê da carek din li nav gund nagerim". Mezina nehiştin kes dû wana keve.

Hesen û Fat destê birbangê gêştibûn gundê Pêxas Hesen, li teqê xist, daka xwe ji xewê rakir.

Daka wî ku jinek li ba di "Hesen ewê li cem te kî ye? Hene te çû dergîsta xwe revand? Te fedî ji nekir? Xecê tu çîma ketî pê vî dînî?" got.

Hesen go "Etê, wa ne Xec e, wa ya Fata Gulê ye, ji gundê Memo."

Daka wî "Wê malê min şewitando, min sala cara tu kirî şuna meriya, te çû ji min ra dujmin çêkirin? Lê dergîstê te ya çîr biwe?" got û meşîya çû cîranek ji xewê rakir. Li mala vî hodek jê ra bi vekirin da û ew di vîrda veşartin.

Di ser reva wana ra sê ro derbas bûn. Li gundê Memo fesad û nexwaz rehet rûneniştin. Korten ku Fat xwasti, Fatê ji ew nekiribûn, dest bi derew û gale gura kirin. Brayên Fatê ji revê bi şû va hîn bi dere nav gund neketibûn. Ew reva li wana pir bi qar dihat. Ji gundê Pêxas ji tu deng bi derneketiwbû. Kesek ne hat, ne çû. Bi xwe û xwe dikelin. Aşîya gala gura nehat. Digotin "Hesen Fat nebir ji xwe ra, ê wê li çiya digerînine."

Li gundê Pêxas tiştekî weng tunewû. Hesen Fat ji xwe ra kiriwû namûs. Kurê Gulê tu pirs nekirin ew gotinê navbera rast in an derew in. Bi wan gotinana tijî bûn. Hesê Gulê bra yê xwe yî biçûk

şande gundekî. Li wir Hemê Hecî hewû. Eşqiyakî bi nav û deng wû. Meriyê wana wû. Vî brayê xwe ra got "Ji min ra Hemê silav ke. Bê ma neke nexwe ma were"

Hesê Gulê di hundurê hodê da berjêr û berjur diçû û dihat. Kû Fatê ci anîye serê wana, ji Hemê Hecî ra kat dikir. Mîna ku heş li sêri tunewûn. Bi ser wan gale gurên ku ketibûn nav gund da, tu yê bêyî qey dîn bûyiwû. Nedizanî ku ci bike. Şer û bela ji rûya da dibarîn. Li seri û binê şora xwe tim digot "Rev rev e, li çiya gerandin ci ye? Va ya bênamûsî ye. Kurê Mala Mihê mane, vê li me bikin? Qey ez mirîme" Hes bi gotinê navbera ketiwû wû halî.

Sev wû. Li gundê Pêxas hîn kes neketiwû xewê. Mihê Kalê ji ber pêz hatiwbû mal. Mih xwanga wî Xec û daka wana Kew di mal da rûniştîwûn. Bavê wana Kal î ne yi li mal bû. Mih ji bo wê hatibû mal ku dak û xwanga xwe bi tenê ranekîn. Ku dergîstê Xecê; Hesenê Mihê, Fat revandibû bi şû va, êdin ê bi dujmin bûn. Jin ku yê di mal da wûn ji, ew bi tenê ci nedihîştin. Her sê ya ji vir ji wê da deng dikirin. Ji nuşka va li ber derî û li ber eqê piste pistek kete guhê wana. Dû va repe repa hespa û dengê merina bilind bû. Mihê mîna ku tiştek dipayı bû cilê rawû, di teqa malê yê paşiyê ra xwe avite derva. Li erdê ket û rabû xwe avite çala gînime li paş malê. Ku xwe avit û navit yekî di hundurê çalê da sê qûşûn di canê wî da hejmartin. Xwîna germ bi ser da hat, tenê go "Ez lavikê Kalê me". Ji xwe derbas û bîr va çû.

Hesê Gulê û heft heyş meriyê din li derva wûn. Du meriyê wî ji deriyê malê şikandiwbûne hundur. Hesê ew gotima Mihê bibîst bi şûva vî hevalê xwe ra "lo te ci kir? Te lavikê Kalê yî bi tenê

kuş?" got. Hevalê vî jî got "Min go qey Hesenê Mihê yê, na hatiyê cem dergîsta xwe." Mih da hemêza xwe û jî çalê biderxist li herdê dirêj kir.

Di mal da du meriya rahiştibûn çengê Xecê ew kaşe derva dikirin. Xecê xwe ji dest wana radikşand, lê tu awil nedikirin.

Daka Xecê ji wana ra digot "Qurbana we me, şerê Mala Mihê we çima kire deriyê min? Keçikê min berdin. Em bê sûc û bê gune ne." Rahiştibû kincê Xeca xwe nedixwas wê bide wana. Halle Mihê xwe yi delal jî newû ku di çi hali da ye. Yekî dest bi Kewê ra na, ew gêr bû. Rawû û go "Gûyê we li porê min, vê yekê li me mekin. Herin şerê xwe di deriyê Mala Mihê kin. Hun jî min xizanê çi dixwazine?"

Kesi guh neda ser wê. Dest û ningê Xecê girêdan û avitin hemêza siwarekî.

Li wê gale galê û bi dengê sîleha cîran li dor mala Kalê gîhêstibûn hev û du, Gundiyên Pêxas dihîrişin wira. Dor û paş wana hewş kiribûn.

Hemê Hecî dengê xwe bilind kir "Şerê me yi vi Mala Mihê ra ye. Hûn nekevin navbera me û wana. Emê naxwazînî ma xwîn birije. Bi şaşî me li lavikê Kalê xist. Ew i niha birîndar e, li paş malê ye. Rê bidin me em herin. Şevê reş e, li ser me giştika tifing hene. We rê neda me, pir meriyê werin kuştinê. Xwîna here laşe yê bi serkevin." got.

Ji wan gotinêñ Hemê bi şûva mezinekî gund got "Rêya wana bidin ma herin. Şerê wana li derê wana be. Ew berpismamê hev û du ne. Şerî vana mekine derî gund". Dû va gundi ku belav bûn, daka Xecê kitana xwe ji serê xwe kir û avite ber lingê siwarî pêşyê. Wan cêmerana pêle kitana Kewê nan û

çûn. Vi wê ra jî erf û edeteke kurda jî dane bin ningê xwe çûn.

Gundi çûne mala Kalê, mîna ku wana gotibû. Mihê Kalê yi birîndar raketiwû. Lê hîn dijini. Arebekâ hespa, Mih avitin ser û şandine xestexana Haymanê.

Wê şevê ji bera mala Mihê kî hebû giştik li mala wan gêstibûn hev û du. Hesen xwe dayiwû dawîya civatê, qe deng nedikir. Va bela vî kiribû derê wana. Hecî hîn li mal venegerîwû. Mezina deng dikir, vî jî guh dida ser wana. Kê mezînî deng dikir mîna ku hev û du teme kiribûn. Giştika şorek dikirin. Gotinêñ wana: "Kure Gulê yê şer in. Heşê wana yê nagêhîne. Qe ne cara jîn nehatîne revandinê. Erê Hesen xwanga wana anî, lê huro jî li benda namûsa wana ye. Waya yêk wana kirî ne gerek bû. Çardehe roya bi şû va Hecîbihata emê li hev bihatanî. Lê ew bi ber hêrsê xwe ketin, bi hêrsê xwe nikânî. Ê hatîn dergîsta Hesenê revandin, lavikê Kalê yi birîndar kirin. Xwînê ketiye ber çavê wana. Heyş-dehe meri ne. Em di dû kevin, em herin ser wana emê giştika bikujin. Ew jî yê qe ku nebe jî me çar pênc meriya bikujin. Werin em neherinî. Em û ew meriyê hev û du nî, ma xwîn nerije." wûn.

Çend xort li emper mezina derketin. Wana jî digot: "Ew werin di horta gundekî da berse çava Xecê birevînin, em jî rûnîn tiştekî nekinî. Em wê qebûl nakînî. Kes naxwazê hun werin. Xortê me yê hene emê bi dû kevin, Xecê ji dest wana bigirin."

Dû wan xortana va, Hesen şor heyna û got: "Mezinêñ me rast deng dikine. Em dû kevin pir meriyê werin kuştinê.

Neçûyin ê rast e. Berdin, ma va bela ku min di we dayi, bi vikasê derbas be".

Mezinek çerxe xorta bû û go "Hun nizanîn, hun ê xort in, cahil in. Li karê veng ku mezina go ci hun jî yê guh bi ser din. Rabin û belav bin." Bi ser wê gotinê da herkes rabû û belav bûn, çûne malê xwe.

Kurên mala Gulê ku Xec revandin bi şû va jî ji dor gundê Pêxas bi dûr neketin, hero şivanek dihat û digot: "Min ew huro li filan derê diyine." Wana yê wexta ku li gund dora wan hewş bû, digotin "Em naxwazin ma xwîn birije." Mîna ku dixwastin Mala Mihê ma were ser wana. Mîna ku li şer û bela digerin. Rokê li çolê raste Osê brayê Hesen û Hecî hatin. Osê Mihê hîn xortekî panzde salî wû. Şivan bû. Pezek ji dest Osê girtin û birin. Osê hat li gund vaya kat kir. Gotibû Xec jî yê li cem wana yê.

Gündiyen Pêxas jî dest bi gale gura kiribûn. Wana jî mîna gundê Memo digotin "Ê Xecê digerinine." Mezinek gund vi mala Mihê ra digot "Wana ye ku huro pêz ji dest brayê we digrin, yê so ji werin jinê we ji dest we bigrin." Bi ser va gotinê nav gund yên xerav da xort û mîrên Mala Mihê jî xûlî bûyi wûn. Kurê mala Gulê sê û çar ro derbas bûyi bûn, hîn ji gund bi dûr neketiwûn wana eşkere meydan dixwastin. Bisikirin xorten mala Mihê êdin rûniştin nediwû.

Xorten mala Mihê rabûn ser xwe. Hesen carek din vi pêşîya wana ket. Nedixwast herin şer. Xortekî sileh ji nava xwe kişand û berê silehê di Hesen alkir û jê ra got "Ya ku tu dikî bênamûsi ye. Serê pilokê tu yi tu yê werî, nehatîyi ezê siftê te bikujim, paşê jî herim ser wan bê arana ka ci dixwazine ma biwînin." Bi

ser wan gotinan da Hesen zanîbû ku yi tu awilê nekê go "de rabin!".

Di ber nîvro, seet nehe-dehe wûn. Dehe-danzde xorten çeleng ji xwe xwaş, her tek ji wana tiремarek bû. 20-25 salı wûn. Hen ji wana yê bi dergîstî, hene xwe ji yê berzewac wûn. Yek ji wana Husê Birê wû. El revandîwû, anîbû gundê Pêxas. Li hespa siwar bûn, tifing û silehê xwe li nava xwe girêdan, ketin rî. Mezinekî gund heta dawîya gund kete dû wana. Digot "Çûyina we ne ya xêrê yê. Werin vegezin." Kesî guh neda ser vî. Li dawîya gund Hemê Molikî jî teve wana bû. Ew jî ji Qışerê wû, mîna Husê Birê li gund şivanî dikir.

Ew xortana ji çiyayêñ dor gund daketinê, hetanî Text çûn. Li wir pir kort û kendal hebûn. Tu kort û endal nehiştin. Lî rastê wana nehatin. Ji Text bi şû va, gundekî tırka hebû. Bi ser nneqewê da wergerîyan. Çemê Samsamê diherikî. Dora avê giştik qamûş wû. Hêdi hêdî nêzîki avê dibûn. Navbera wana û avê 30-40 metro hewû an ji tunewû. Xortekî ji wana digot "Kurên Gulê tîrsîyan zanîn ku emê werinî serwana, reviyan". Hîn şorê di dêv da bû, ji nûşka va bi teqe teqa tifinga meydan bû toz û dûman. Mîna baranê qurşin bi ser wana da dibarin. Hen ji wana ji hespa da li herdê diketin, hena ji xwe ji hespa da adavitin herdê. Qire qîra wan xortana, dengê tifinga û dengê hespa tev û hev diwû. Xwe davitin kort û kendala ku xwe ji qûrşina biparêzin. Qûrşin ji nav vî qamûşî da dihatin. Lî kes ji wana va xuya nedikir. Çar pênc deqa, ne Hesen, ne jî hevalên wî tu deng ji silehêن wana derneketitû. Ketiwûne pûsiyê. Giştika xwe şas kiribûn.

Hesen di korteke biçük da xwe veşartiwû. Kevirek ji xwe ra kiriwû talde. Bê birîn bû. Çar û pênc deqa bi şû va, ji nav qêmûş da jî ar hate birînê. Hesen wê wextê li piyê xwe yi çepê mîzekir ku ci mîzeke? Sê xorten delal û bejn wek rîhan li kîleka wî bêcan di nav xwelîyê da raketine. Yek ji wana Hus bû. Husê Birç, siwarê Elê. Wîngê Hesen nizanî ci bike. Radigerî. Bi xwe û xwe sond xwar û got "Ku min jî yek ji we xwaş cîhişt û ji vir çûm, ma ezi nemeri wim." Ü rahiştê sileha xwe û ar kir. Ku Hesen dest bi êr kir, hevalên xwe yê ku hetanî wê wextê bê deng mayin ew jî hatine xwe. Wana jî dest bi êr kirin, gale gal kete nav kurê Gulê jî. Xuya dikir ku hen ji wana jî birîndar ketin.

Şer sê-çar seeta dewam kir. Sê-çar seetan bi şûva, tifinga Hesen germ bû. Edin ne diçerpand. Hevalên wî jî tu deng jê dernediketin. Dehe-panzde deqa bêdeng di şûna xwe da rûnişt. Kurê mala Gulê ku Hesen ar birî bi şûva guh dane ser xwe. Zanîbûn ku Hesen bê sileh ma. Hêdi hêdi berve vî dihatin. Hesen nerevî, rabû ser xwe, tifinga xwe avite herdê û jî wana ra got "Hun dua bikin tifinga min germ bû, Min hûnê yek bi yek bikuştana" Wana tu deng nekirin. Ji wana du meriyan hatin rahiştine piyên Hesen ew gér kîrin û dane herdê. Hesê Gulê li ser vî rûnişt û devê wî bi vekirin da. Ew ci hêrs û ci kîn bû nizanim, zimanê vî xorfi bi xwaş jî dev kîsand û qetand avit. Qîre qîra vî deng vi dinê dida. Mîna çûçika serjékirî xwe bi herdê va dida. Bi wê nebû, Hesê Gulê rabû ew da ber qûrşina û bedena wî qul qulkî kir.

Mîna ku gotibûn rast wû, xwîn ketiwû ber çavêن wana. Nedizanîn ku ci dikine. Hin ewê li herda meytê Hesen

bûn, rîvîyek xuya bû. Li ser hespê wû. Paçêki gewr li çoyê xwe pêçayî bû. Hemê Hecî vi kûrşinekê ra hespa di bin vî da gér kir. Ew axayê vî gundi tirk wû. Hemê ew nas dikir. Jê ra got "were". Ku ew berve wana dihat ji nav qêmûş da Hemê Moliki bi der ket û xwe avite paş vî merî. Hemê Hecî ku ew dî got: "Wî ji paş xwe biderxe. Te ew bi derxist, derxist, te dernexist ezê bi kûrşinekê ra bedena we herduyan jî qul bikim!" Hemê Moliki ew gotina bihîst bi şûva ji paş vi bixwe bi derket. Lê bi derket û neket jî horta henîya xwe da kûrşin xwar û jî pê da gér bû.

Kurê Gulê ji xwînê têr nexwarin. Mirî û birîndarê xwe berhev dikirin ku bi rîkevin. Ji dûr va keriyek pez vi ber çavên wana ket. Zanîn ku ew Os e, brayê Hesen i biçük e. Duhî pezek ji dest vî girtibûn. Disa li wê derê bû. Birayê Gulê yi biçük li hespa xwe siwar bû û çû cem vî. Mîna ku gotibûn ew Osê Mihê wû. Ne sedî kir, ne jî ji Xwedê tirsî, ew xortê panzde salî jî da ber kûrşîna û vejerî.

Kurê Gulê ya vi xwe ra kiriwûn. Sê birîndarê xwe heynan, berê xwe dane çiya û bi rî ketin. Dû xwe va jî gundê Pêxas pênc mirî û çar birîndar jî mês û mozan ra cîhiştin çûn. Ew ketibûn navbera dill û mirada. Nehîştin Hesen û Fat, Husê Birê û El bi ber miradê xwe gêştana. Ew bi xwe di pê kîşan miradî wûn, kesî nizanî.

Gundîyên Pêxas bi mîr û jina ketiwûn rî. Jina porêñ xwe dirûçikan-din û digirîn, çûn jî nav terla ji kort û kendalan mirî û birîndarê xwe berhev kirin. Dev û bîvilêñ mirîya û birînê wana tîjî mês û moz bûywûn. Birîndar di nav xwelîyê da nedihatîn naskirin.

Pêxasan ew li ereba bar kirin û jin û mér ketin rê.

Royê li ber ava wû. Erebeýen ku meyitên wan xortêñ bi dergîstî û berzewac li ser, giran giran diketin nav gund. Gundî bi dora wana ketiûn. Ber mala Mihê mîna mahşerê wû. Gundiyên Pêxas bi mér û jina va li wir wûn û şin dikirin. Fata Gulê û yara Husê Birê El li ser sokanê di nav jina da wûn. Porê xwe rûçikandine, rûyên xwe kiribûn dûrme. Şîn dikirin. Ji ber çavekî wana da hezar hêstirk dibarî. Ku ew arebana ji Fatê va xuya bûn dest bi kilama xwe kir digot.

*Hayê hatin hayê hatin  
Henê erek in, henê tat in  
Mala Mihê bi mala Gulê va  
Bûne heft dûlgera li ser min  
Rûreşê rûreş li hev hatin*

*Kekê min hene dîn in  
Zimanî Hesenî Fatê Mestê  
Bi xwaşî ji dêv dikişînin  
Govendê mês û moza  
Di ser ra digerînin  
Yara Husî Birê yê  
Rûreşâ mîna min rûreşê  
Di boyaxa min heldikşînin*

*Gundê me bişewite li xar da  
Di cîyekî bi xuelî û xûbar da  
Ez bi dîyarê Mala Mihê ketim  
Seeta lêvíke bi kostek hûna bi dûcêr da.*

Dora dine royê wû. Hecîyê Mihê li ber malê rûniştîwû. Mezinên gund xwe dayibûn dorê. Ji Qışêrê hûnnî vegeŕiya wû. Tismala xwe di dest da, daka wî kilam digotine ew digirîya. Bi xwe û xwe li xwe xerav dibû. Royek hatibû dawestiyabû. Ew li mal nehatibû dîyinê. Birayêñ xwe di vî şerî da bi tenê

hîştibûn. Tu li mal rûneništ. Çar merîyen xwe heynan û kete pê kurêñ Gulê. Çiya bi çiya li wana geriya. Çend roka bi şuva li kèleka Çemê Sûr li gundekî tirka di çiyakî da ew hewş kirin. Hengorî wû. Hevalêñ xwe di çiya da bi şûn kirin û hetanî siweda bi tifinga li ber hev dan.

Destê berbangê wû. Hêdi hêdi her der rûnî dibû. Ji paş zinarekî va kumê jinekê xuya bû û com bû. Hecî ar bi birîn da. Sê-çar deqeya bi şuva ew rabû ku Xec e. Destê xwe heyna û got "Ar mekin, ew revyan!" Xec bi lez meşî û hat xwe avite sûyê Hecî. Bi ser hev da girîn. Hecî ew heyna û vegeŕiya gund.

Mihê Kalê di xestexana Haymanê da bîhst roya bi şu va mir.

Hecî, dergîsta Hesen, Xec li gund da mér û zewicand. Fatê Gulê li xwe mar kir û ji xwe ra kire bermalî.

Siweda zû wû. Giran giran serma ji dest pê kiri wûn. Ëdin şivana hêdî hêdî pez dikişandin hewşoya. Li ezmana ro tunewû. Ezmanê ewravî bûn. Li ber mala Hecîyê Osê, arebeke hespa dawestiya bû. Li ser arebê bavê Elê hatiû Ela xwe ya delal yara Husê Birê ya bêbext bibe Qışêrê. Du jin ketiûn pîyên Êlê. Serê wê reş girêdayî wûn. Saltê wê bervajo likiribûn. Ew dianîn ku bi rê kin. Fata Gulê ya ku El <di boyaxa xwe helkişandî> ew dî û meşîya, hat destê xwe di sûyê wê ra avit, dest di sûyên hev û du ra birin, bi ser hev da girîn. Wana jina na, ew bi zorê ji hev vegetandin û El li arebê nan. Arebe bi rê ket hetanî ku bi ser neqewa da hêl bû. Fatê çavê xwe ji dû wana nebirîn. Arebe ku li ber çavêñ Fatê da com bû ew hate xwe û çerx bû berê xwe da mala xwe û çû. Baranek hûr dibarî.

# Zivingê-1

*Musa Anter*

Min gotibû; dizanim bê li kuderê hatime dinyê.

Êh, jiyana zarokekî şikeftê. Wê bê bala kê. Ramana min bi vî rengî bû.

Bi ser gelek teklifande jî, nedihate hişê min ku ez çîroka jiyana xwe binivîsim. Lê bi kalbûnê re, belkî jî ji ber kombûna serpêhatiyan, ev xwestin li cem min pêk hat. Şairê bi nav û deng û mezin ê kurd, Ehmedê Xanî, di pêşgotuna ferhenga xwe ya kurdi - erebîya bi navê Nûbara biçûkan de wiha dibêje:

**“Ne jî bo sahib rewacan  
Belkî jî bo biçûkêd kurmancan”**

Îca, bi îlhama jî vî mirovê mezin, ez jî bîranînê xwe jî zarokên xwe re lê dikim. Bi hêviya ku ji gelek zarokên şikeftan re, li ser rêya jiyanê bibe ronahî...

Navê gundê min Zivingê ye. Ziving tê wateya cihê zivistana. Lê zivistangeha me ne mîna yên miletên dewlemend ji bo sportên çêle û şahiyan, belê ji bo zivistanan lawir lê bisitîrin. Li welatê me gelek Ziving hene. Bi piranî, navê eşiretên wî cihî li zivingan bûye. Wek mînak, ji Zivinga me re, Zivinga Temikan û ji yên din re jî Zivinga Hebîzbînî,

Zivinga Botan û hwd, hatiye gotin.

Hecêb e, kesen bi meraqa zanyariyê ji van Zivingan derketine jî hene. Mirovê ku diwana binav û deng ya Melayê Cizîri ji kurdi qilibandiye Erebî, Mele Ehmedê Zivingî bi xwe ye. Dûra li Qeza Surî, Qamişlokê muştîti kiriye.

Ji xwe re li wê kerametê binêrin, di ser serdemâ şikeftan re ev nêzîkî 7000 sal derbas dîbin. Zivinga me, bêyî ku jî me bipirsin, hukumeta zalim ya demê, te digo qey nav li hesp û kûçikên xwe dîkin, ji nişka ve, navê Zivinga me kîrin “Eski Mağara.” Em kin lêxin, piştî 65 salan ez bûm “Eski mağaralı”.

Van rojan bulgar navên tirkên Bulgaristanê diguherin dikin Bulgarî. Tê gotin ku ev kar bi mirovayetîyê re li hev nake, li dijî masfîn mirovan e, falan filan... Hûn nebêjin ku bulgaran ev sûc ji tirkan fêr bûbin. Qede û bela, guhertina navan ne tenê hatiye serê şikeftên me, li welatê min çiqas gund hebûn, bêyî ji xwedîyên wan bipirsin, bi tirkî nav li wan kîrin. Ne gund bi tenê, lê herwiha navên gelek vilayetan ji guhertin. Mesela, Diyarbekir bû Diyarbakır, Elezi bû Elazığ, Dêrsim bû Tuncelî, û Şırnak bû Mazıdağ. Yê din jî nişanek erzan bi wan vekirin. Ji Entabê re Gazientap û ji Urfa belengaz

re Şanlı-Urfâ gotin. Ez nizanim bê çîma Mêrdinê hatiye ji bîkirin. Ji Mêrdinê re jî bi hêsanî "Fakîr Mardin" dikarîbû bîhata gotin.

Erê, ev Eskîmağara di navbera berriya ku ji Iraq û Sûrî dom dike û t ê û çiyayên Tûr Abdîn de, gundek 20 şikeftî ye. Bêguman piştî serdemâ jeolojîkî çaran ev herêm yek ji warê sitara insanên herî kevn e. Ji ber ku qismek ji şikeftan xwezayî û hinek ji wan ji hatine çekirin. Ava wexwarinê li gund tune ye. Ava baranê berdidin çalan, jê vedixwin û bi kar tînin. Vê dema dawî, ji Stîlîlê (bi navê xwe yê nû Akarsû) bi boriyan av anîn jî, lê bi ser neketin. Ji zaroktiya min ve, çaxa ava çalan nedima, ji gundên cîran û ji serê kaniyên Zivingê bi ajalan av dianîn.

Hatinâ gund kêm û piçûk ji ziraeta bejî ye. Genim, ceh, nîsk, nok, şolik (ku her li herêmê bi tenê çê dibin) kizin û nokreşik diçandin. Li cihêن şûvan ji tahlik, şebeş, hicûr, garisê spî, haşik û genek ku pir bi qîmet in, runê wê ji ya fasûlyê soya ji çêtir e û bi sedsalan dohnê wê ji bo ronahiyê tê bikar anîn, têne çandin. Bi kastî ji gundê me ji xwedîkirina lawiran re pir bi kêr tê. Şikeftên wê fireh in. li gund kesî xerîb tune ye. Çaxa Osmanlı hatîn rojhîlat û dest bi tapokirinê kirin, gundê di destê me de li ser navê kalkê min yê mezîn Enterê Mihuteze hatiye tapokirin. Helbet malbat mezîn bûye û gund di nava merivan de beş bûye.

Gundê min li bakurê rojavayê Nisêbînê dikeve û 25 km. jê dûr e. Ji esrên kevneşop tê zanîn ku ne bi tenê xwedîkirina lawiran û çandiniya bejî, lê berhemâ tîrî jî li gundê me pêk hatiye.

Lê, iro li ser axa me mîwek jî peyde nabe. Bi ser wê de ku li mezra gund hin ji cihê 8 mahzerên tîrî hene. Ji gelek parçen qahsiyêن kevn merov tê dîghê ku berî dema musilmaniyê, li gor xwe, bi hecmeq mezîn, şerab hatiye çekirin. Piştî musulmantî qebûl bûye, çekirina dimsê şûna ya şerabê girtiye.

Ji kesen li dervî malbatê yêñ li gund re cîran dihate gotin. Bi qasî ji me re divibû me erdê xwe diçand û yê dima me dida cîranan. Ciran ji ji her kar û xizmeta me re amade bûn. Li miqabil erdêñ diçandin, ji hatina xwe 1/10 didane me. Ev kar hemû bi qîm û dilxwesi pêk dihatin.

Dûra teraktor derketin. Dem guherî. Ji her timayê cîranen li ber dilê me şérîn, belabûn. Li holikên (Gecekonduyêñ) bajaran perişan man. Hîna ji gava em û cîranan li hev rast tê, mîna merivêñ nêzik em hevdû himbêz û maç dikin û bêhejmar serpêhatiyêñ xwe di bîr tînin.

